


XAYÎLAZA REŞÎD

# KANİYA DİLÊ MİN

XAYÎLAZA REŞÎD

# KANİYA DİLÊ MİN

LÎRÎKA
ŞİÊR
KUR'TEÇ'ÎRONG

P'İRTÛKXANA ÊZDİYA

T'İBÎLÎSÎ
2007

BERPİRSİYAR (RÊDAK'TOR) – **K'AREMÊ ANQOSÎ**

DÎZAYÎN – **ÎRAKLÎ ŞÊŞÊLÎZÊ**

# EZ Û JÎÎNA MİN

Zarotiya min ma ort'a ç'iya – baniya, devî ava. Dive ew k'işiya tevî avê belekiya... Lê bîranînêd min da k'ûr maye. Û her êvar li wê me, mala me da. Oda me îdî germa xwe hildaye ber qirç'e – qirç'a sova k'omirê. Qilpe – qilpa çayîdangêye ser sovê dik'ele. Vaye dayîka min jî, wê ç'enge pûng dêst da ne, davêje nava çayê. Xûşk û birêd min dora t'exte r'ûniştine, hîviya şîvêne. Ez wê ji kaniyê avê tînim, bişkorîke malêye t'amim...

Lê hê xew da nim, gundê xwe P'ampê (Sîp'anê) da nim, xewna min şîrine, xaşe.

Sala 1964 – a, 14 meha h'ezîranê ez gundê kal – bava da, P'ampê ji diya xwe hatime dinê. Malbavanê min e'slê xwe da Sîpkî bûn, ji bereka Şemsika. Mala bavê min mala xwendevana bû. Diya min Zadîna Seyîdo şeherê T'ilbîsê da mezin bûvû. Mala bavê min da qedrê xwendinê p'ir' digirtin. Hela hê kalikê bavê min gotibû, qelemê hildne destê xwe, bixûnin.

Ser giliyê kalkê xwe bavê min, R'eşîdê Mîrze Mîrzoêv li Ermenîstanê da xwendina bilind distîne. Di wî zemanî da bavê min bi qulxa xwe va meriveki nav û deng, k'ivş bû, komîtêêd merk'eza neh'iya Aparanêye komsomolê û partiya komûnîstiyê dixevitî, çûbû ber şer'ê h'emdiniyayêyî duda û, çawa milet dibêje, bi çîn û mêdala va veger'iya bû. Paşî şêr' bavê min çend salê dirêj serwêrtiya gundêd Çobanmazê û P'ampê dikir. Paşdaviyê, h'etanî k'utasiya e'mrê xwe, bibû dersdarê dibistana gundê me P'ampê. R'emetiyê bavê min navê dersdarê Ermenîstanêyî emekdar sitandibû. Ewî gelek û gelek şagirtêd hêja milet r'a mezin kiriye, meriyê p'ir' e'yan, çawa Şerefê Eşir, E'merîkê Serdar, Mak'sîmê Xemo, Mirazê Ûzo, E'zîzê Cewo, Şîraliyê Eşo... Navê k'ê hil dim, navê k'ê hil nedim... P'ampê h'eta r'oja îr'o jî dersdarê xweyî emekdar bîr nekiriye.

Ne jî ez colanga zarotiya xwe P'ampê û mervêd wî bîr dikim. Her tişt bîra min da ne. Vaye Wezîrê Eşo, nivîsk'arê k'urda, dox'dirê zara, û şayîrê k'urd Simoê Şemo mala me da r'ûniştine û t'evî bavê min k'etine xeberdanê, be'sa h'alê dinê û lîtêratûra miletê me dikin. Eva ne carek bû, ne duda...

Giliyêd maqûl, t'erbetê giran ez vir' hîn bûm, min ji vir' bir. Mek'teba e'wlin, qelema e'wlin, dersdarêd e'wlin min li wê hîştin. Çawa dersdarê min, şayîrê k'urdî e'yan Fêrîkê Ûsib şêrekî xwe da nivîsiye – „P'amp cinet bû, P'amp muh'bet bû, P'amp ziyaret bû"...

Erê, mamostaê minî r'emetî, îro giliyê te dîsa dik'evine bîra min da. Te t'imê ez ji zara diqetandim û himberê min r'ûdiniştî, qeyî tê bêjî, te dilê xwe min r'a dixast ve kira. Lê ez zara deh – donzdeh salî min çawa dikaribû te fe'm bikira?

Dibekê te r'u'h'ê min da h'unurê bedewetiyê t'exmîn kiribû û mêla min dikir. Heyî diniya, îr'o mamostaê min, Fêrîkê Ûsiv xwe daye p'ala ç'iyayê Dibûrî, çawa carna xwe – xwe digot:

„T'irba min çê kin milê ç'iya,
Bira ser hêşîn be gul û gîhiya,
Lê biç'êre kar, bexêd miya".

Wek xewna xweye herşev ez dîsa ser r'ê me, diçime mek'teba P'ampê. Vaye, wê odê da, oda mamosta da r'ûniştine Cewoê E'mer, R'eşîdê Mîrze, Fêrîkê Ûsiv, T'êmûrê Mîro, Bek'irê R'ostem, Hêrîknaza K'amil û mamostaêd mayîne ermenî. Lê bîr nekim, dîsa E'zîzê Cewo Mamoyan - „K'urda Mad".

Dersdar E'zîzê Cewo gazî min dike ber t'exte, divê, binivîse. K'ils destê min da ne, destê min nagihîje t'exte, t'exte bilinde. Bi hêrs k'ursîkî tîne ber t'exte, ç'eplê min hil dibir'îne, min ser k'ursî dide sekinandinê û divêje: „De binivîse, tê k'engê mezin bî û destê teê bighîje t'exte!" De, ez wê îdî mezin bûme, ji t'extê zar'otiyê p'ir' dûr çûme.

Paşî mirna bavê min mala me derbazî bajarê Êrêvanê bû. Min Êrêvan h'iz ne dikir. Min bîra hevalêd xwe, der û cînarê xwe û dersdarêd xweye gund dikir. Min bîra dersê bavê xwe dikir.

Dersdarê minî e'wilin û yê dawiyê jî bavê min bû. H'iz kirina bavê himberî qîza nazik min r'a bû h'izret, ew bûbû giranîke mezin ser dilê min. Derpekê r'a min her tişt unda kir. Derd û kula r'a min çarxeteke ha lê kir:

„Bavê min,
Tu hebûyî xayî û xudanê min,
Tu çûyî, te şikênand istûna dilê min,
H'eta hebim tu naçî ji bîra min".

Evê r'ojê da min qelema şayîrtiyê hil da destê xwe û ez bûme „dengbêj". Min ser dersa dizîka va şi'êr lê dikirin. Bona wê yekê dersadara t'imê min r'a şer' dikirin, wekî ez p'akî guh nadme dersa, „nizam çi va mijûlim".

R'ojekê jî min îzn da xwe çend şi'êrê xwe hil da û ez çûme rêdak'siya r'ojne'ma k'urdî „R'iya t'eze", qesta r'ojne'mevan Egîtê Xudo û nivîsk'ar E'merîkê Serdar kir. H'eta wana şi'êrê min xwendin, ziravê dilê min qetiya, ez bêsebr hîviya cawa wan bûm. Axiryê şi'êrê min dane destê min û min r'a ha gotin: „Herge dixazî bivî şayîr, gerekê tu ze'f û ze'f ser xwe bixevitî".

Meseleke miletê me ha heye, divê, diniya ha jî namîne. Eva bû qisa min.

Paşî k'uta kirina mek'teba Êrêvanêye hejmara 160 –ye ort'e, sala 1981, min xwendina têk'nîkiyêye ort'e jî ber mek'tebê r'a pêk anî. Peyî hine wext min mêr kir û ez ji Êrêvanê derbazî şeherê T'ibîlîsê bûm.

Min malbeteke xweş û şîrin mala R'izaê Çerkez Maxsoyî da çê kir. Bûme bûk, bûkeke r'û bi xêlî. Piş „p'erda bûktiyê" da jî min t'erka nivîsara şi'êra neda. Xezûrê min çar zar' dabûne ber xwendina bilind. Ça divêjin, Xwedê bextê min anî. Çawa berê, malêd geleka

miletê me da xwendin bona qîz û bûka qedex'e kirî bû. Lê mala xezûrê min da r'iya xwendinê vekirî bû. Vê yekê jî k'omek da min k'arê e'frandina şi'êra dirêj kira.

Şi'êra mine pêşiyê sala 1985 r'ojne'ma „R'iya t'eze" da r'onayî dît.

Bajarê T'ibîlîsê da salê 70 – da „Şêwra cahalêd k'urda" k'arê xwe dimeşand. Serokê „Şêwrê" K'eremê Anqosî bû, zanekî baş û êginekî pêş, r'ojhilatnas. Li „Şêwrê" da t'ov divûn h'emû xwendevanêd k'urdê T'ibîlîsê. T'imê êvarînê baş dihatine derbaz kirinê, konsert didan, pêşengêd h'unurmenda çê dikirin. Malxwê min Feyîzoê R'iza jî t'evî xebata wê „Şêwrê" dibû. Divên: „Koro, çi dixazî?" divê, „R'onaya h'erdu ç'e'va". Xwedê min r'a li hev anî û ez t'evî Feyîzo diçûme ewê k'oma cahala. Ser êvarîna min t'imê şi'êrê xwe dixandin, çend cara jî min sikêç nivîsîn û zar'o hîm dikirin, ser konsêrta r'aberî t'emeşevana dikir. Sikêça „K'erem", sikêça mine e'wil bû, k'îjan jî ser dik'ê sala 1995 –da zar'a lîst û t'emeşevana ser darê p'iya, bi desthevxistina gur bilind qebûl kir.

Ser van şi'rêd min, k'îjan jî vê k'itêbê da hatine cî kirinê, mamosta K'eremê Anqosî bi h'iz kirin û k'ela dil xevitiye. Bajarê T'ibîlîsê da „Xalê K'erem", çawa ez pê r'a divêjim, min r'a bû qidûm, bû qiniyat evê diniya e'frandinê da.

Ez wê yekê baş dizanim, wekî bi sêwrandina şi'êra va min borcekî giran hildaye ber miletê xwe, r'êke bedewetiyêye çetin daye ber xwe. Lê gumana Xwedê bi k'iriyamet û feresatê xwe va ezê hê zêde zimanê dêye şîrin r'a şa bim, nona moriyêd kulîlkêd bînxaşe ç'iyê ser şirîtê t'op bikim û bi dengê nazik bistrêm, pesnê miletê xwe bidim, welatê kal – bava K'urdistanê h'iz bikim û bip'arêzim.

## DİNİYA R'AZA

Şeve, şeve, diniya r'aza,
K'ete xewa hingorî,
Ker' bûn r'efê quling – qaza,
Xanima vekirin guhar – morî.

Legleg hêlûnê da teliyan,
Gula serê xwe berjêr kir,
Beq jî gola da ne weqiyan,
Dergûşa dayîk hişiyar nekir.

Kaniya nekire xuşe – xuş,
Qeyî bê westiyan, seqirîn,
Cewika naên guşe – guş,
Hiş bûn, dengê xwe bir'în.

Şeve, te'riyê e'rd hilç'inî,
İstêrka e'zman belek kir,
Hîv ça sinîk serobinî,
Li diniyayê t'emaşe dikir.

Yanga h'işiyar t'enê ezim,
Hîvê, bivîn h'alê min,
Min lêkirin lome, gazin,
Mitala r'evandiye xewa min.

*

## XAYÎLAZA REŞÎD

## BEXTÊ T'UNE, ÇÎ LÊ BİKİM

Bextê t'une, çi lê bikim,
Haqa ber Xwedê lava kim,
Haqa dua', dirozga bikim,
Bext t'uneye, çi jî bikim.

Bedewbûnê çi ji lê bikim,
Sifetê gul ger tenî kim,
Çarşevekê ger xwe wer kim,
R'ûç'kê xwe ji benda h'eram kim.

Xanim – Xatûntî çî min r'a ne,
Ça bikim nazikiya xas jinane,
Ça bikim sewta şalûlane,
Ça bikim, ev gişk, çî min r'a ne.

Bêje bexto, bexto bêje,
Min h'iz nakî, çima, bêje,
Sal – sal k'aş û berk'aş kirim,
Layîqî nekesa kirim.

*

## BÊK'ÊFÎ, EZÊ TE R'A BİSTRÊM

Serê xwe bide ser sîngê min
Û bik'eve xewa şîrin da,
Wê nerm bibarin hêsrê min,
Bip'ekin ser ç'e'vê te da.

Bêk'êfî, ezê te r'a bisitrêm,
Û bir'evînim xem – xiyalê xwe,
H'etanî sivê ezê ha r'ûnêm,
Bihênije, r'azê, hilde xewa xwe.

Ezê t'ûncika te r'a bilîzim,
Û serê te nerm dayînim ser belgî,
Ezê r'ex te da hêdîka p'al dim,
Te r'a bir'icifim, ça Leyîla bengî.

Hêdî, dizî va t'ilî – p'êç'iyê te
Bivme ç'e'vê xwe, ez te r'a h'eyîran,
Bese, a'ciziya bikî, va me, li r'ex te,
Îşev vir' mame, li te bûme mêvan.

*

## ÇİMA, BÊJE

Çima, bêje, bêje, çima,
K'etî k'ir'ê xas xanima...
Xas xanimê qur'e, qubet,
Êl - e'şîrê da neke r'obet.

Bihêl, bihêl, bira her'e,
Ser milê xwe da nezivire,
Bir'a bavê hûr gulava,
Ew werdeka devî ava.

Dive bigirî, tu nehêle,
Hêrs be ser da, bike hêle,

**Ber dila da hêdî werê,**
**Boyî ner'êje hêsirê je'rê.**

**Û car dinê nazik – nazik,**
**Bigire t'ilî – pêç'iyê mij – mijik,**
**Paç' ke t'iliya tu yeko – yek,**
**Ça bikin destê r'oja neheq.**

**Serê wê bide ser sîngê xwe,**
**Le'zekî bide ber bîna xwe,**
**Bîn ke gul û gulistanê,**
**Evê Xanima K'urdistanê.**

**Lê bîr neke, tu wê r'êke,**
**Lezo – bezo zû ver'êke,**
**Bihêl, bihêl bira her'e,**
**Ser milê xwe da nezivir'e.**

*

## NÊÇ'ÎRVANO

**Ez zanim ez me'siya zêr'înim, delalo,**
**Delalê dilê min,**
**Lê ez nak'evme h'emû t'ora...**
**Ez kareke beyanî me, kara xezala...**
**Gele nêç'îrvana daye dû min da,**
**Lê ez nebûme nêç'îra t'u kesî da,**
**Nêç'îrvanê min...**
**Nêç'îrvano, were destê min bigire**

Û min bive cem dayîka xwe da,
Bir'a dayîka te min bivîne...
Bê, dayê, îsal çend sale ez nêç'îrvanim,
Lê min hela nêç'îra ha nedîtiye,
Ne bînaye...
Bê, dayê, hîvîke min ji te heye,
Were nêç'îra min bivîne...
Bê, dayê, ez zanim tê nêç'îra min
Dilekî na, h'ezar dilî bih'evînî.
Bê, dayê, were, nêç'îra min bih'emlîne,
Dayê...
Bê, dayê, destê wê bigire û bive nava
Qîz û bûka, qîz û bûkê xwe.
Bê, xanim – xatûneke ciwane..
Wê bive çirpîniva qîz û bûka.
Wê t'emam her t'ebiet p'iya.
Nêç'îrvano, te tîra xwe avîtiye
Nava dilê min da,
Te dil û hinavê min xişivandiye,
Lê tu zanî ez çiqa birîndarim?
Nêç'îrvano, navê min navê
Xatûna kurmancîye,
Delalê min...
Ez zanim, ku ez nêç'îra te me,
Lê, were, min berde.
Sit'ar heye boyî navê Xwedê,
Min nehêle van xiravciya...
Min berde, ezê dîsa her'me
Cî û warê xwe,
Milê ç'iya, wan bilindciya.
H'eyîfa mime, nêç'îrvano,
Delalê min...
Were, min nehêle devê gêlî,

XAYÎLAZA REŞÎD

Ez nemînim çolê...
Were, min neke dev û diranê neşûştiya
Û xurê gurê serê ç'iya...

*

## K'ANÊ, K'UYÎ

Çiqas – çiqas şevê bê xew
Safî kiriye min boyî te,
R'uh'êm nona sir'sûmê dew
Hatiye k'ilandin bê feyîde.

Û t[illegible]yê da te ger'iya me,
Min jî t'irê va têyî,
R'ûniştî hîviya te mame,
Hêsrêm r'ijiyane ça lêyî.

Sur'a bê darê r'a lîstiye,
Biye xuşîniya van belga,
Dengê te ber guhêm xistiye,
İsitraye h'eta berbanga.

Dîsa – dîsa şeveke din,
Haqa berbang aha çûn,
Usa kul k'etine dilê min,
Salê min bi zelûliyê çûn.

*

## BÛKA DAYÎKA MÎN

Bûka ber p'erdê, bûka dayîka min,
Dizanim bêsebr sekinîî hîviya min.
Îr'o gele mêvanin dora min,
Ezê naha mêvana ver'êkim,
Ber xwe nek'eve, ezê zû bizivirim,
Zerza derê me dêrî va kim,
Paşê bêm p'erda te wêda kim.
Ezê xêliya te nerm hilbirim,
Wekî sil nevî...
Bi destekî destê te bigirim,
Destê dinê sifetê te bilind kim,
Û bême cem te û te r'amûsim,
Wekî agirê ç'e'vê te bivînim,
Agirê evîntiyê...
Ew çava duşuxule,
Min ne dîtiye, min ne bînaye..
Dixazim bivînim...
Lê tu şerm dikî,
Serê xwe ber min berjêr dikî...
Nonanî xêliya ser ç'e'vê xwe,
Soro – moro divî,
T'evî – hev divî...
Ç'e'v û biriyêd te gulêd h'eyatê,
Berjêr dinêhêrin,
Şewqa hîvêye sifetê te, berê xwe neguhêre,
Tu min binihêre.
Dixazim bivînim agirê ç'e'vê te,
Zanim tu xweda nerm dişewitî,
Nonanî agirê ant'êxê..
Û dîsa – dîsa serê xwe ber min berjêr dikî,
Ji min şerm dikî.

Bûka dayîka min, tu min şerm neke,
Ç'e'vêd xwe belek, tu ber min veke,
Ber min şewq vede, min r'a bik'ene,
Ez birîndarim, dilê min şa ke.

*

## BÊ BEXTİN EM

Melûl, melûl min nenhêr'e,
Ne tu mêrî, ne tu şêrî,
Zanim qursaxî, gele qure,
K'ê tirsiyayî, k'ê newêrî.

Zanim, dixazî bextewar bim,
Min r'a bêje çi teherî,
Bêyî te bêje çawa şa bim,
Ne ez bende me, ez jî merî.

Ewî bengzê teyî melûl da,
Ne ez xwexwe xwe dibînim,
Bengzê te sur' da ber minda,
Paşî te k'ê bih'ebînim?

Em hingûfin zanim, zanim,
Lê bext ort'a me da şûr danî,
Lema jî melûlî dizanim,
Bêbextin em, tu r'ind zanî.

*

## ÎLACA MÎN

Îlaca min,
Sitara min,
K'uyî berbanga dilê min,
Te h'ermandiye xewa min,
Ax, ça h'işke berseriya min.

Belgî nîne,
Ew istrîne,
Dor û guhê min dêşîne,
Gaz - gerdenê min dih'er'êşîne,
Sing û berê min dixişvîne.

Were bal min,
Bîna ber min,
Destekî bide ber serê min,
Destê dinê ser p'orê min,
Bira bîna te bê serê min.

Ez te bîn kim,
Te h'emêz kim...
Malê dinê ezê çabikim...
Dinya r'onik ezê bîr kim,
T'enê, t'enê te r'a şa bim.

Ez nexweşim,
Ez bedh'alim,
Tu nehatî, ez dih'elim,
R'oj bi r'oja xiravtirim,
Xwedê, çima ez namirim!

XAYÎLAZA REŞÎD

## DİZÎKAVA EZÊ BÊM

Dizîkava ezê bêm
Û bivme mêvana te,
Lê zanibe, r'oj naêm,
Kes nevîne Leyîla te.

Şevê erê, te'riyê da,
Ku r'azayî be diniya,
Û bin şewqa hîvê da
Ezê bêm nona horiya.

Lê tu, lê tu h'işyar be,
R'ûnê k'êleka kaniyê,
Wê xul – xula avê be,
Wekî nek'evî xewê.

P'iste – p'ista kulîlka
Ewê jî hêdî mêl bin,
Wan r'a bike h'eneka,
Heyî ç'e'vnihêr'iya min bin.

Cewkê te r'a bisitrê,
Beqê bikine weqe – weq,
Baê lêxe bilûrê,
Me r'a de'watê dike t'ebiyet.

Bax pê çiqlê der û dor
Bira girêdin p'erdê,
Xaşxaşk jî pê belgê sor
Min r'a h'azir kin xêliyê.

Wedeye, îdî ez têm,
İstêrka govend girtiye,
Kevotkek berbi min tê,
Berbûye milê min girtiye.

Ez û tu „bûk – ze'vane",
R'oj dir'evin ji benda,
Em maşoqê sur'êne,
Ciyê me t'une van e'rda.

*

## EW XEWN BÛ

Şevê xewna min da têyî
Û ber serêm r'ûdinêyî,
Destê xwe nav p'orê min dixî
Û k'el û bîn tu digirîî.

K'ela dilê te r'adibe,
Hêsir ç'e'vê te xalî nabe,
Melûl – melûl tu digirîî,
H'eta sive safî dibe.

Bi dilekî birîn, evînî,
Destê xwe ser zendam datînî,
Ûsa min r'a dir'icifî,
Newêrî milêm hilbir'înî.

Nazik – nazik û e'zîzî
Zincîra destê min r'a dilîzî,
Zincîrê nerm dizivir'înî,
Zanim, zanim çi dixazî.

Hêdî r'adibî, p'iya diseni,
Ûsa k'ûr dikî axînî,
Ser min da hêdî kûz divî,
Bîna xwe k'ûr hildiç'inî.

Lêvêd nazik ser e'niya min,
R'adimûsî pişta guhê min,
Û ber xweda tu divêjî:
„R'azê, r'azê e'zîzê min".

Ji berseriyê diçî binp'iyê,
Dest davêjî tu lih'êfê,
Dilerizî şewat – şewat,
Min dip'êç'î bi vê h'ubê.

Hêdî – hêdî min dûr dik'evî,
Oda xewê derdik'evî,
Tu min xewê da dihêlî
Û nişkêva beta divî.

Nizam, p'encerê r'a diçî,
Nizam dêrî r'a tu diçî...
Diçî nona siya şevê,
Dil û hinavêm dibiçivî.

Hanga ç'e'v û biriya vedikim,
Dîn divim û te digerim,
Ne hema hêja vir bûyî,
Lê k'a k'uyî, h'izreta min.

Tu r'ast hatî yan derew bû,
Yanê ew horiya şeva bû,
Min tu dîtî, min tu dîtî...
Lê, t'exmîna min, ew xewn bû.

*

## „E'MELA" TE ME

Ezê bimrim ser destê te,
Tu min ç'e'l ke bê minet,
Bira hêsa bin hestiyê te,
Hela nebûme „qexbet".

Ber mirinê guh bide min,
Çend şîretê min hene,
T'emîz ke hêsra ç'e'vê min,
Negirî, neke tu xeme.

P'or' û guliyêm hêdî şeke,
K'aw – k'aw min bixemilîne,
Xişir t'emamî min va ke,
Min ke k'incê kurmancîne.

T'ilî, pêç'iyê min r'ind çê ke,
R'eng ke tu van neyînika,
R'engê sor û sipî lê ke,
Bedew kem nona keç'ika.

T'enê ç'e'vêm r'eş kil nede,
Pişta ç'e'vêm qelem ke,
Bira qelema qaweyî be,
Qawe min tê, t'exmîn ke.

Xêrk dikarî sêre sivik
Gurç'kê sûrtêm sor ke,
R'engê gevez, gele tenik
Lêvêd min xe, ze'f be'l ne ke.

Gorêd r'îse nexş çêkirî
Dayîne li binp'iya min da,
Sermoke me yeke qefilî,
Divekî tême p'ê da.

Ku r'icifîm û lerizîm,
Min bide ber dilê xwe,
Pîzkê xûdanê min civîn,
Zaha ke pê dezmala xwe.

Dev û lêvêd min bimiç'iqin,
Ava axretê bide min,
Ezê cîda p'ir' i'cîz bim,
Fesal xwe bide ber p'ala min.

Lê ezê nerm t'ilî, pêç'iyê te
Bivme h'erdu ç'e'vê xwe,
Ezê bimrim ser destê te,
Bîr neke „e'mela xwe".

*

# MİN T'İRÊ TUYÎ

Baê lê xist, derê min vekir,
Min jî t'irê ew tuyî,
Serda p'or'ê min t'evî hev kir,
Evî baê hêrs bûyî.

T'evî hev bûm, ji cî r'abûm,
Min kir ku bikme gazî,
Kes t'unebû, cîda sar bûm,
Dest û p'iyê min lerizî.

Tu nîbûyî, ez bi qurba,
Xapiyam ez vî bayî da,
Veqepiç'îm, k'eliyam k'erba
Û te ger'yam te'riyê da.

Min destê xwe dîwar p'eland,
Axîn min hat, k'izirîm,
Ba qesta dilêm şewitand,
Û k'el û bîn ez girîm.

Ba h'esa te min r'a anî,
Dîn kirim, ça nevêjim,
Siya te ser dîwara danî,
Ku dîwêr va hilk'işim.

Min h'emêz kir dîwarê sar,
Bêtona bê zar – ziman,
Bê dil – cegerin ev dîwar,
Sar û sarin sal – zeman.

H'emêza te hat bîra min,
Baxçê gul û cinetê,
Îdî çir'ane e'mrê min,
Ku te mame h'izretê.

Qudûm nekir r'abime p'iya,
Bidim dû bê û herim,
Bivme k'oç'era serê r'iya,
Îdî pajda nezivirim.

Bêjmê da ezê, baê ne's,
Min xilaz ke vê zulmê,
Çiqas çerçirîm, îdî bes,
Kul gihîştin wek hurmê.

Divekî ba ciyê te zane,
Bira min bîne cem te,
Bûm qaliveke valane,
Ç'e'vê min man li r'iya te.

## DİXAZİM, TE BİKİME E'YNAT

Usa dixazim, te bikime e'ynat,
Ji te bir'evim h'eta qyamet,
Ça tu derk'evî nonanî r'oê,
Ez beta bivim nonanî hîvê.

Em hev nevînin sal h'eta salê,
Min neh'evînî ça qûla malê,
Û cehan jî dewremîş bive,
Bir'a ç'e'vê min ç'e'vê te nek'eve.

Bona te bivme kevra binê bîrê,
Bişimitim ça me'sya binê be'rê,
Nêç'îrek ne's bim, nek'evme t'elê,
Ne jî bir'tisim t'eqîna gulê.

Bivme kareke xezala beyanî,
Xirav bim nona Zîna Bek'oê E'wanî,
Te'l û tir'ş bim ça kaniya zilindar,
Bedbûna kevir – kuç'ika bînme xar.

Usa dixazim, te bikme e'ynat,
Ji te bir'evim h'eta qyamet,
Ça tu derk'evî nonanî r'oê,
Ez beta bivim nonanî hîvê.

*

## Ç'E'VÊ MÎN DA

Ç'e'vê min da R'ostemê Zalî,
Qeremanî ç'evê min da,
Extiyar nînî, her cahalî,
Şîrinî ber dilê min da.

*

## ÇÎ BİYE TE R'A

Çiye, dixazî bivî Xwedê,
Çi bû te r'a.
Te hev dûr xist ewled û dê,
Çi biye te r'a.
Pêştirî te kesek t'une
Vê dinê da?
Şewitîme bê sûc, gune
Evîntiyê da.
Bûyî lêyî, şûştim birim,
K'uda divî?
Ze'f jî dînim, sewdeserim,
Çima divî.
Van hêsira zeft kirime,
Qe navînî?
H'esav ke girtiya h'evsê me
Û „beyanî".
K'en bû h'izret, k'anê şuret,
Tuyî sevev.
K'anê namûs, k'anê xîret,
Bêje sevev.
Hîvî dikim min bihêle
Ser k'oka min.
Bese îdî çiqa k'etî
Tu k'ir'ê min...
Yan te t'irê gula sorim,
Nazik, nazdar,
Hewa da meriya vediçir'im
Ça gura h'ar...
Lê tu were, dil bê bexte,
Naê yolê,

Tir'sim naha, min bê we'de
Bavê çolê...

✻

## KULÎRKA XÛŞK R'A

Deqe zû – zû dû hev diçin,
R'oj usa zû derbaz dibin,
Sal jî nona bawîşkekê,
Lê nav û deng zemana, xûşkê.

✻

## LÊ TU ÇÛYÎ, ÇÛYÎ...

Min r'a bêje horiya şevê
Vê berbangê k'uda çûyî?
H'işiyar nebûm şîrin xewê,
Lê tu çûyî, çûyî, çûyî...

✻

## NEGRÎ DİLÊ MİN

Negrî dilê min,
Negrî dilê min,
Naha eveke, tê derêyî ji qefesa min,
T'u car, t'u car nabî qûla min,
Bes, çiqas te dît zelûliya min,
Her'e xilaz be,

**Bira bin gunê te da**
**Nemîne îsafa min...**

*

## Û NEÇÛMA...

**Xwezî îşev kevotk bûma,**
**Min daniya ber p'encera te,**
**Xwezî xewna te da bûma**
**Û neçûma ber serê te...**

*

## BOYÎ BÎRANÎNA K'ULFETA E'SLAN ABAŞÎDZÊ S. 2003.

**Diniya heye xanek t'ijî,**
**Qelfek r'adibe, qelfek dijî,**
**Lê E'slanê meyî delal,**
**Gelek hene nona we jî...**

**Diniya heye bi niç'e – niç'e,**
**Qelfek r'adibe, qelfek diçe,**
**Lê E'slanê meyî delal,**
**Diniya ha tê, ha jî diçe...**

**Diniya heye bi mirinê,**
**Em mêvanin li vê dinê,**
**Lê E'slanê meyî delal,**
**P'ir' girane derdê jinê...**

**Magûlî gula dinyayê,**
**Wex diniyayê, te bê wayê,**

Lê E'slanê meyî delal,
Gula te çû, îdî naê.

✻

## LAWÊ MÎN R'A

Lawê min, hela biç'ûkî,
Hîn nabî li dibistanê,
We'deê bê, tê mezin bî,
Bivî mêrxasê K'urdistanê.

Kur'ê bavçê ber dinêye,
Şêr ji şêra bîter dive,
Berxa çê berk'ozê çêye,
Sêv ji darê dûr nak'eve.

Lawê p'adşa nabine qûl,
Hil de k'itêb û qelemê,
We'de îdî hildaye şûr,
Bive ulmdar boyî a'le'mê.

Ziman hîn be, h'ezar zimanî,
Wek Arxîmêd û Arîstotêl,
Xever de înglîsî, almanî,
Hil de zêna Xanî, Alîşêr...

E'mir – jîîna t'opa dinê
Mêze ke çend qur'na pêjda,
Xaş ke jîîna K'urdistanê,
Milet nemîne te'riyê da.

✻

XAYÎLAZA REŞÎD

## HÛN R'İND ZANİBİN

Dixazim r'abim
Dilê xwe vekim ber miletê xwe,
Dixazim r'abim
Gilî – gazinê xwe bêjme miletê xwe…

Ezê biqîr'im
Û miletê xwe t'ov kim dora xwe,
Ezê bigrîm,
Bira bivînin hêsrêd dota xwe.

Ezê bikme hewar,
Werên bibhên hûn zarîniyêd min,
Bikme zare – zar,
Werên melh'em kin hûn birînêd min.

Hîvî we dikim
Hûn dûr nek'evin xûşk û birayêd min,
Kes pêştirî we
T'u car nikare bik'ire dilê min.

*

## BİRA BİÇ'ÛK NEQUSİN

Bira biç'ûk nequsin,
Ça kulîlk neç'ilmisin,
Bira guldin r'û dinê,
Me r'a bînin şabûnê.

Cefê dayîka girane,
Ew ne giriya destane,
H'evt sala ji avê, agir
Mezin dikî t'eva çêtir.

R'o bi r'o pê r'a şa divî,
Difirî, fir'naq divî,
Deqê çetin zû diçin,
Hew nihêr'î, mezin divin.

Ew cûckêd du na pêr,
Divin xatûn, divin mêr,
R'ojê zarotiyê ze'f k'înin,
Qencî, xiraviyê bîr tînin.

Nazik xayî ke qîzika,
Zanibe qedrê kur'ika,
Ewled dergê polane,
Ewin xayî – xudanê me.

*

## GİŞKA T'EVÎ HEV NEKE

Qadrê Mottî, ç'e'vê xwe veke,
Diniya ne r'o – de'neke,
Her gulekê bînek jê tê,
Gişka t'evî hev neke.

Hene jin û hene jinkok,
Hinek mir'canin, hinek bişkok,
Hinek gulin, hinek keleng,
H'emiya neke netiştok.

Xanim – xatûnê kurmanciya
Nan davêjne sêlê milê ç'iya,
Ber konêd xwe dimeşin,
R'astiyê bi wan tê bîna diya.

Me nexeyîdîne Qadrê Mottî,
Miletê me gilîkî wa gotî,
Lê yaziya kor çima xasa
T'imê dide mêrê k'otî...

*

## BİRA VEBE DERGÊ XWEDÊ

Diçime mala Xwedê şikiyat,
Le'zekî veke dergê xwe,
Ez navêjim ç'îr'ok, h'ikiyat,
Ezê bêjim gazna xwe.

E'wrê r'eş le'zekê dûr xe,
Şiver'êkî çê ke tu,
Deqekê min diniyayê der xe,
Çima usa „qureyî" tu...

Ez jî beniadema te me,
Dilsaxekim û xêfik,
Yekr'ojiyê da maşoqa te me,
E'mrê min p'ir' çû, ma hindik.

H'eta k'engê hîviya te bim,
Gumana te mam her wext,
H'eta xweşe, hema habim,
R'ojam te kir t'ext û bext.

Qelpê saxa begem nakî?
„Dilqalima r'a hevalî",
Bêje gelo çi h'iz dikî,
Xêrk tu r'astî, xêrk h'elalî.

Bext te p'ar vekir „dexesa",
Diniya wan r'a kir „cinet",
T'eze k'etme h'ese – h'esa,
Te ez „bîr kirim" bê minet.

Min çi dîtiye wî divêjim,
Bux'dana nizanim ez,
R'aste şayîreke dengbêjim
Dîsa berxa te me ez.

*

## BESE DİLO, BESE

Bese dilo, bese, çi ji min dixazî,
Bes h'inga min xe, min bike gazî,
Bes dilo, bese, bese min hev xî,
Min ji sînor û k'enarêm der xî.

Nonanî ava ç'emekî xweş nerm
Dik'işiyam r'eh'et, serbilind, bê şerm,
Naha te hewareke usa min xistiye,
Heyîlo kevrê binê „bîra min jî" derxistiye.

H'etanî k'engê tê ha min bikî,
Bêj, îdî zêde tê çi ji min bikî,
Giliyêm dizî va eşkere dikî,
Nava êl û e'şîrê da min „r'ûr'eş" dikî.

## XAYÎLAZA REŞÎD

Min çi zanibû, usa bê îsafî,
Min t'irê ç'ûkî, hela dilsaxî,
Nona cûcika fir'îî destê min,
Îdî derenge, nak'evî qewza min.

Bes, îdî bese, giliyê min neke,
Qe na, çend giliya tu min da xayî ke,
Ne em heval bûn, hevalêd şîrh'elal,
Ne tu t'emiz bûyî wek kaniya zelal.

Dişewitî tu xwe r'a şev û r'oj,
Bûyî qert'el da wek ç'iyayê berr'oj,
Gelo hêjayî hêsîriya teye
K'ê jî ev agir berî te daye.

Çi hat serê te, dilê belengaz,
Zanim tenikî û gelekî naz,
Gelo k'ê kevir – kuç'ik avetne te,
Gelo k'ê şih'itand cî û warê te.

Divekê nifir' te kirin, dilê min,
Tu ji min „dûr xistin" hevala min amin,
Bextê te me, dilo ber te têm lava,
Were em h'eval bin dîsa wek gava.

Te serî usa ji min istandiye,
Ez h'ejandime, r'uh'êm maşandiye,
Bê h'idûr bûyî wek zara colangê,
Nahêlî r'azêm h'eta berbangê.

Bese dilo, bese, çi ji min dixazî,
Bes h'inga min xe, min bike gazî,
Bes dilo, bese, bese min hev xî,
Min ji sînor û k'enarêm der xî.

## R'ÛNÊ R'EX MİN, NONA DERSDAR

Sîng û berê min zozanin,
Lawiko were tu lê dayîne,
Gaz – gerdenêm morî – mircanin,
Dest bavêjê, jorda neyîne.

Lit'vam xul –xula avêye,
Tu ber ç'eng ke, hil de vexwe,
K'ulamam sewta E'yîşêye,
Sazê Şivan qeyî lê dixe.

Ç'e'v û biriyêd min belekin,
Brû û bijangêm gul û sosin,
Melûl bûme, fesal ve dikim,
T'eze h'ub û evîntiyê dih'esim.

Dilkêm naze, gele nazdar,
Zerp lê dixe, min dih'ejîne,
R'ûnê r'ex min nona dersdar,
Dest nedem, min neşewitîne.

Fitla te r'a tir'sim mêl bim,
Xwe bavêjme ser milê te,
Ustyê te da ez darda bim,
Bivme „tenî" boyî xwe, boyî te.

Diha başe t'erkam bike,
Min bihêle vî h'alî da,
Namûsê tu min r'a ç'ar ke,
Nek'evme devê nemerda da.

☀

## K'URDİSTANAM ÇAR P'ARÎ

Dilê min biye ker – kerî,
K'urdistanam çar p'arî,
Miletê min êr –êrî,
Em bûn bêriya bir' – bir'î.

☀

## WÊ XEWA K'ÛR DA

Berxewa îşev wê xewa k'ûr da
Yançiye, ez bûme kewek gozel da,
Difir'îm qur'e, serbest û aza,
Diçûm Lalişê ber „Dara miraza"...

☀

## XİRDİR NEVÎ

Xirdinevî, Xirdir – Eyîlaz,
Tu diger'î gêdûk û gaz,
Dighînî hev bext û miraz.
H'emû miletê diniyayê
Bi te dikin eşq û şayê.
Ez jî qîza dînê Êzdiya,
Ber te dikim dia', dirozga,
De tu were hewara min,
Bighîne bext û nirazê min.
Hewara Memê h'efsê da kirî,
Syabendê qeyê da kewkî kirî,
Leyîl û Mecnûnê xerîv kirî,
Aşiq Qerîb ku te birî,
Ç'iyayê Kocor peya kirî,
Sazê wîî darda kirî,
Dayîka wîye herr'o girî,
Dergîstiya wîye xêlî kirî,
Hindik maye xelqê birî,
Lê te mirazê wana kirî.
Were mirazê min jî bike,
Derda didî, derman bike,
P'erda ber ç'e'vêm wê da bike,
H'izkiriyê min nîşanîm bike.

*

XAYÎLAZA REŞÎD

## DENGÊ TE...

Dengê te usa mest kirim,
Dengê te usa me't kirim,
Dengê te cî da sar kirim,
Vêsandim û bê fe'm kirim...

*

## TE EŞQA MİN BİR

Dilê min digirî,
Ji hêsîriya min,
Hêsir dibarin
H'erdu ç'e'vê min.

Lerzek k'etye
Qidûmê çokê min,
Nefes nemaye
Li ber r'uhê min.

Dixazim r'a bim
Ser darê p'iya,
Cîda sar divim
H'esavê miriya.

Ç'e'vê min r'iya te,
Dêrî dinihêrim,
Dengê gavê te
Min t'esele nabin.

Tu ji min xeyîdîî,
Te ez bîr kirim,
Tu k'uda çûyî,
Were e'mrê min.

Ez hîviya te me,
Hergav bêsebr,
Lê tu nehatî,
Te eşqa min bir.

## TE NEPİRSÎ H'ALÊ MİN

Tu bûyî kul,
Bûyî k'eser,
Tu bûyî derd,
Bûyî mezer,
K'etî nava dilê min.

Bêje çima
Te ha min kir,
Agirê dilê min
Diha gur' kir,
Şewtand dil û hinavê min.

Min tu dîtî,
Te ez dîn kirim,
Lê tu çûyî,
Te ez bîr kirim,
Te nepirsî h'alê min...

## WERE, WERE, QEYÎDÊ BERÊ

Were, were, qeyîdê berê,
Were dîsa min bivîne,
Çapik – çeleng berjêr werê,
Destê min bigire, min bigerîne.

Hema – hema hîviya te me,
Gune, me'lûl û belengaz,
Xewnê da jî ç'e'vnihêriya te me,
Têm pêşiya te serqot, p'êxas.

Ezê ber te t'emene bim,
Çava xulam ber p'at'şê xwe,
Dixazim qurbana te bim,
R'ast divêjim ber Xwedê xwe.

T'enê werê qeyîdê berê,
Diniya bêyî te çî min r'a ne,
Xêr û xezne, malê dinê,
T'emam qirêja destane.

Her te bivînim r'ex xwe da,
Carna ç'e'vê te binêhêrim,
Ezê werqa ç'e'vê te da,
T'eze diniya r'on bivînim.

Were, were, qeyîdê berê,
Were, dîsa min bivîne,
Çapik – çeleng berjêr werê,
Destê min bigire, min bigerîne.

*

## TU ÇA JÎ HEYÎ, HEMA USA JÎ TE H'ÎZ DİKİM

Navê te şîrine nonanî hingiv,
K'enê te jî istrana bilbil,
Lê hêrsa te e'wrê biharê,
Kevir û kuç'ika tîne xarê.

Wek lêyê nişkêva r'adivî,
Çi ber te dik'eve dişoyî, divî,
K'av û k'ûn dikî çayîr û mêrga,
Îdî napirsî xas û nemerda.

Dema diziviri tu nona te'vê,
P'encê te vî alî, wî alî davê,
E'wrê giran t'ev bela divin,
Gul û sosin ber te ve divin.

Ez zanim, zanim, wekî t'ebiyetî,
Tu him ce'nimeyî, him jî cinetî,
Lema jî ez dîn bûme ser te,
Tu çi jî bikî, ez h'iz dikim te...

*

## LÊ EZ MAM GUMANA TE

Ez t'îbûnim, tu avî,
Were kaniya dilê min,
Dik'işî, çima min navî,
Nagihînî meremê min.

Ez r'êwî me, tu ç'iyayî,
Tu min hilde sîngê xwe,
Ser te mam met'elmayî,
Ça Zînê ser Memê xwe.

Ez sorgulim, tu bilbil,
Çima min r'a nasitrêyî,
Dilê min da h'ezar kul,
Dermanê min t'enê tuyî.

Ez leglegim, tu hêlûn,
Bihêle dayînim r'ex te,
Teyîrede gî firîn çûn,
Lê ez mam gumana te.

## T'ENÊ TUYÎ GULA MİN

Min nizan bû çiye k'en,
Lê tu min r'a k'eniyayî,
Te min r'a got caniya can
Û tu min r'a h'eliyayî.

Min naziya xwe ser te kir,
Min berê xwe te guhast,
Te serê min hevraz kir,
Dev û lêvê min alast.

Giriyam, here ji dûrî min,
Min xast ji te bir'evim,
Te t'emiz kir hêsra min,
Te got, neçe mala min.

Te got, şêrê Xwedê me,
Bihar bike, eyî Xanim!

Ezî r'astî bengî me,
T'enê tuyî gula min.

*

## Ç'EMO, K'UDA DİÇÎ LEZ

Ç'emo, k'uda diçî lez,
Min jî xwer'a tu bive,
Dilê min da kul, merez,
R'ih'ê min şêlû dibe.

Min bive be'ra bêbin,
Bira kes min nevîne,
Salê bên û derbazbin,
K'ê wê min bîra xwe bîne.

Ez p'êlê te naritisim,
Ne jî guşîniya dengê te,
Ça t'eşîkî bir'êsim,
Ezê bivînim zimanê te.

Ezê te r'a heyî bêjim,
Heyî bîna xwe bistînim,
Derd û kula bir'êjim,
Û r'iya xwe biqedînim.

Hewaltiya min p'ir' xweşe,
Ezê te r'a bisitrêm,
Zû bike ç'emo bik'işe,
R'êwîme, t'evî te têm.

*

## BÊXEWTÎ

Îşev dîsa t'eqisiye xewa min,
Mitale wê civiyane dora min,
Bêhêlin r'azêm, dûrî min k'evin,
Belkî kul û derd bîra min her'in.

Dilê min girane, bîna min tenge,
Ser serê min te'rî, dûman û çenge,
Gelîkî k'ûre û ez tê da me,
Nevxêr, dîsa ez ort'a we da me.

Bes, îdî bese, hûn çi dixazin,
E'seye hergav we bikim gazin,
Bêyîsafno, usa jî wê dimirim,
Hûn bê ît'barin, ez we nikarim.

Ca bêjine min da, ez k'uda herim,
Ça ji we bir'evim, t'erkeserî dinêbim,
Hûn hergav p'ê - p'ê dû min tên,
H'eta heye şev, h'eta siteyîrk hiltên.

*

## GERMAYA Ç'E'VÊ TE

Ber germaya ç'e'vê te
Dilerizim, divim r'isas,
Usa dih'ele ber te
Ev sifetê minî naz.

Xeberêd te usa xweş,
Nona kaniya dik'işin,

Gul û sosinêd h'ezar nexş,
Qeyî dora te dicivin.

Û diçinî van gula,
Min r'a hergav tu tînî,
Şîrin nona bilbila,
Xweş – xweş min r'a dik'enî.

Cinet ber min vedive,
Ez ç'e'vê te dinêhêrim,
Dilê min te r'a şa dive,
P'er'ê min t'une bifir'im.

*

## QULİNG

Quling fir'în çûn,
Ez xwe r'a nebirim,
Sozê xwe p'oşman bûn,
Ez çarç'e'v kirim.

Ez gune, me'lûl,
Dû wana giriyam,
Lê ew fir'în dûr,
T'ewqê min wan qetiya.

Û ez bê guman,
Pajda zivir'îm,
Ji cî warê wan
T'enê mam êt'îm...

*

XAYÎLAZA REŞÎD

## EZ QURBAN

Were xewa min, were,
Bîna ber min tu were,
Diniya min r'onik were,
Dilê min bêyî te dizare.

Hêsrê min bûne baran,
Nona kaniya ew k'işiyan,
K'enê min bû baê sar,
Nazik nînim, gurek h'ar.

Guliyê min bûne qamçî,
Ber te bûm me'r cî bi cî,
Gul û nûr min dibarî,
Bûme pîrek sed salî.

Bedew nînim ça berê,
Nona kara xezalê,
Çing nakim ez bilindciya,
Te r'a nakim laqirdiya.

Ne çirpî bûm, kulîlk bûm,
Leglega devê ava bûm...
Te ez kirim kula kor,
Wê şe'deye yekî jor.

Dîsa ç'e'vê xwe ve ke,
Carkêj mi t'emeşeke,
T'exmîna min dîsa ez,
Gulek sorim ça gevez.

Ça werdek ez dimeşim,
Lê ber ç'e'vê te ez r'eşim,
Zanim t'une bextê min,
Navînî xasbûna min.

Lê, dixazim dîsa bêyî,
Qeyîdê berê min hilêyî,
Ezê te hildinı dil û can,
Te r'a bêjim:„Ez qurban!"

*

## DÎLÊ MÎN BAL TEYE

Nizanim, bona çi
Ez te h'iz dikin...
Û t'imê ser te
Duşurmîş divim.

Divekî tu...
Ew dîsa ezim,
Yan jî em h'erdu
T'evî hev yekin.

Dêşe dera te,
Pê r'a nexweşim,
Dik'enin ç'e'vê te,
Te r'a k'êfxweşim.

Tu ça dizivir'î,
Zanim çi dixazî,
Û min dinêhêr'î,
Qure, xwer'azî.

Ber te diçim têm
Nona xanimekê,
Çiqas hiltînim
Wek okêanekê.

Be'ra bêbinim,
Sebra min p'ir'e,
Ez ne ç'ivîkim,
Dilê min bifir'e.

Dilê min bal teye
P'at'şê diniyayê,
Te ça zeft kiriye,
Ku r'a pê nayê.

*

## TU VİRA JÎ HÊRSA MİN R'ADİKÎ

Wekî ez mirim,
E'seyî werê ser t'irba min,
Ji kêlka min bike silavek şîrin,
Hîvîke min te heye, tu neçinî
Ew gul û sosinêd ser min.

Bihare, bira ew gul û sosin şîn bivin,
Wekî payîz bê, wê xwe biç'ilmisin,
Dewsa te ewê destê min r'amûsin,
Wê min fe'm bikin,
Wê min r'a hewal bin,
Wê min r'a hogir bin.

Ez t'enê nînim, lema jî nar'tisim,
Fesal û fesal, p'êl gula neke,
Wan cî r'aneke, t'emiya min bîr neke,
Çi jî min dixast te min r'a bigota,
Gulê bejne min,
Ezê t'evî wan bik'evime
Gilî – gazina û gote – gota.

Ku baran barî, wekî bih'elin berfê belekiya,
Dilê xwe neke, ewê min xayî kin ji şilî – şilopya,
Yanê jî h'esav ke, ew hêsrêd minin,
Usa k'el û bîn jorda dibarin,
Digirîn h'alê min.

Ku hewa sar be,
Yanê ba r'a be,
Hewa hev k'eve,
Ez zanim ew çiye,
E'cêvmayî neve,
H'esav ke, ew jî hêrsa teye,
Tu min dîsa t'evî – hev dikî...
Bihêle, bese, ezê bêjme te,
Tu vir'a jî hêrsa min r'adikî...

*

## E'MRÊ MÎN ŞÎRÎN TUYÎ, TU

Serêşa min tuyî, tu,
Derman dîsa tuyî, tu,
R'uh'ê ber bîna min tuyî, tu,
Çima bawer nakî tu.

Hêsrêd ç'e'vê min tuyî, tu,
K'enê ser lêva min tuyî, tu,
Bêxewbûna min tuyî, tu,
Çima bawer nakî tu.

Dibezim, leza min tuyî, tu,
Sebr, sik'ana min tuyî, tu,
Zarîniya dilê min tuyî, tu,
Çima bawer nakî tu.

Dimirim, r'uh'ustîn tuyî, tu,
R'adibim, r'uh'ber tuyî, tu,
E'mrê min şîrin tuyî, tu,
Gelo, bawer dikî tu?..

*

## EZ MELÛLİM

Ez me'lûlim, ne serxweşim,
Wek werdeka hûr dimeşim,
Lê tu dûrî, te diger'im,
P'er û baskê min diweşin.

Der û dorê min xike - xalî,
Ç'e'vê min r'iya te her alî,
Bêyî te e'mr çî min r'a ne,
Çi diniyake boş – betalî.

Ev tebiyeta t'êre – t'ijî,
Her kes xwe r'a ker – lal dijî,
T'enê ezim gune, me'rûm,
Her r'o digirîm, k'elam t'ijî.

Xwezil bêyî nona teyîra,
Hêdî ber konê min daniya,
Minê xwe biqincila hevda,
Xwe bida bin p'er' û baskê te da.

⁂

## BERBANGA SÎVÊ

Berbanga sivê
Nayê xewa min,
Dilê min bi h'ubê,
K'ew nayê birîna min.

Dih'elim ker' – lal,
Guhê min der va,
Ç'ivîkin zare – zar,
Digirîn ber min va.

Ç'îvte – ç'îvta wan,
Xeber didin min r'a,
Usa dilowan
Tên ber dilê min da.

Divên, tu negirî,
Ne, bihar xweşe,
Bes bifikirî,
E'vda ser - r'eşe.

Ne hûn nizanin,
Çiye evîntî,
Loma min nekin,
Xever din Xwedêtî.

⁂

## KULA MİN

Heye kula min,
T'uneye hevala min,
Gazina bêjmê da,
Hêsabe dilê min.

Dixazim xilaz bim,
Ez van mitala,
K'uda bir'evim,
Ca bêjne min da.

Xwe bavêjme avê,
P'êla r'a herim,
Yanê qeyê da
Xwe jor da berdim.

Îdî westiyam
Ez evî e'mrî,
Ez ça xilaz bim
Evî agirî.

Kesek nizane,
Çiye kula min,
Bira bimîne
Ser'a dilê min.

## DEWSA XWEDÊ

Ez Xwedê gelekî bawer dikim,
Gazî Xweda dikim,
Û herr'o – hergav ez ber ta divim,
Duya – dirozga dikim.
Tu hatî û te dewsa Xweda girt,
Bêje, k'êyî tu.
Ez te divînim, Xweda „bîr dikim",
Bêje, bona çi?
Te dûrî min xist, ji dilê min der xist,
Destê min Xweda „kir".
Dîsa şand jorê, berbi e'zmana,
Bêje, te çi kir?
Te ez dîn kirim, sewdeser kirim,
Sevev tuyî, tu.
Diniya şe'deye, tu mêrê çêyî,
P'êxemberî tu.
Lê dive r'astî jî, dixazî dilê min da
Dewsa Xwedê „bigirî", tu.

*

## TU R'AZABÛYÎ

Tu r'azabûyî
Xewa şîrin da,
Min tu hişyar kirî,
Nizanim çima.

Dive min
Bîra te kiri bû,

**Bê h'ed, bê h'esav,**
**Lê min nizan bû.**

**Dengê xewixî**
**Va guhê min da,**
**Dive hêrs bûyî**
**Tu ser min da.**

**Ezê hêdîka**
**Te r'a bisitrêm,**
**Nonanî horiya**
**Ji te dûr k'evim.**

**Tu dîsa r'azê**
**Xewê şîrin da,**
**Divekî ez bême**
**Xewna te da.**

*

## HÎVÊ – HÎVÊ...

**Hîvê – hîvê bêje min,**
**K'a çi dike delalê min,**
**Dive r'azaye xewa k'ûr da,**
**Ez nak'evme bîrê da.**

**Bêjê, bê, delaliya te**
**Ew digirî bona te,**
**Bêxew maye, hişiyare,**
**Bê deng, bê h'is dizare.**

**Bê, me'lûle dilê wê,**
**Dilqê wê dilqê sêwiyê,**
**Bê, ezim hevala wê,**
**Nîvî dikim derdê wê.**

**Bêjê, bê, te bîr nake,**
**Hema gazî te dike...**
**Bê, dimire ker û lal,**
**Hêsîr, me'rûm, ustuxar.**

✻

## MAŞOQA TE ME

**Ça dik'ene dêmê te,**
**Gele r'emin ç'e'vê te,**
**Lepê h'irç'a destê te,**
**Qursaxê şêra qursaxê te.**

**Çapik – çeleng bejna te,**
**Beza piling r'eva te,**
**Sawa gura sawa te,**
**Qe t'uneye tirsa te.**

**Tîr û kevan ç'eka te,**
**Kara xezala nêç'îra te,**
**H'afa gêlî mala te,**
**Çayîr – çîman nivîna te.**

**Sewta bilbil dengê te,**
**Ava kaniya şerbeta te,**
**Şewqa hîvê ç'ira te,**
**Ç'iya û banî hevalêd te.**

Ba û baran de'wata te,
Gul û sosin berbiyê te,
Tu Mecnûn, ez Leyla te,
Ez ça bûm maşoqa te...

## DİL Çİ DİXAZE Jİ R'UHÊ MİN

Wekî ez milûk bûma,
Ezê t'acê zêr' bûma,
Ser serê te bûma,
Xwe r'a r'ex te bûma.

Aha hêsîr nebûma,
Û bermaliya te bûma,
Her'r'o te r'a şa bûma,
Bûka dayka te bûma.

Nikarim te bîr bikim,
Digirîm, ç'e'va kor dikim,
Şewitîm, dur'iya Xwedê,
Gelo, k'ê hewara min bê.

Sêla sore dilê min,
P'eritî hinavê min,
Kesî din naxazim bivînim,
Wê çava be h'alê min.

Qudûm neman çokê min,
Çima ha hat serê min,

Dimirim, qe bawer nakin,
Saxe – sax min ç'e'l nakin.

Ez qurbana R'ebê te,
Ne ez benîyadema te,
Sebir – sik'anê bide min,
Dil çi dixaze ji r'uh'ê min.

⁂

## QEYÎ

Qeyî, te dil kir yeke din,
P'oşman bûyî tu ji min,
Te pişta xwe min da kir,
Derdê dinê min r'a ç'ar kir.

Ez bê derd bûm, bê kul bûm,
Nona gula baxçe bûm,
Çima te ez ç'ilmisandim,
R'oj bi r'oja h'elandim.

Hêsir kirine p'ara min,
Te bir k'enê devê min,
Te bir e'şqa dilê min,
Tu bûyî e'melê serê min.

⁂

## SED H'EYÎF

Fesal, devê birîna xwe veneke,
Kul r'azayîne.
Kula ji xewê h'işiyar neke,
Dilî birîne.
Binixême nonanî zar'êd colangê...
P'ir' bê h'idûrin.
Belkî k'ûr r'azên h'eta berbangê...
Ew ze'fin, ew hûrin.
Ne yeke, ne dudu, p'ir' p'ir'in, p'ir'in,
Zêre – zêra wan...
Ne jî ç'ivîkin wekî bifir'in,
Ewe hêlûna wan.
Qonax çê kiriye, wan dil û hinavê te,
Cem te nazikê...
Nahêlin tu şa bî, birin eşqa te...
Sed h'eyîf, r'indikê.

*

## T'ÊYA

T'êya min, Têya,
Kewa li hewa,
Horiya zyaretê,
Xûşka Axretê.
Qaşêd ç'e'vêd te
Kaniya Zimzimê,
Sifetê min nazik
Tê da tê xanê.
Biriyêd te qeyît'an
Ç'emê Feratê,
Bijangêd dirêj

Gulêd h'eyatê.
Bejina alfîdan
Dara sipindarê,
Navkêlka zirav
P'ir'a aminayê.
Sor, sipî dikî
T'evî sorgula,
Xêr, bawer nakî,
Tu pirske dila.
T'êya min, T'êya,
Tu dota gurca,
Ez dota êzdiya
Pesnê te didim
Her der û her ciya.

*

## EVÎN NAMİRE

Xwezil, xwezil, gede lawikê min bahata,
Şerm – namûsê li r'û dinê lap hilata,
Bi destekî qalim zenda min bigirta,
Destê din jî sûretê sor biqurç'anda.

Minê jî nonanî bûkek r'û bi xêlî,
Sereberjêr qebûl kira h'ezar dilî,
Ç'e'v û bir'iyêd xweye belek te vekira,
H'uba dila, sur' evîntî gilî kira.

Ax, bê r'ojim, bextê min min r'a nayê yolê,
Nona Xecê diçim li ç'iya, serê çolê,
Divêm, Siyabend k'uyî, were delalê min,
Wext buhurî, were berbanga dilê min.

Divêm, xwezil, Xecê bûma, lê tu Siyabend,
Biçûma ax-berê sar, ker' û lal, bê deng,
Lê na Xecê – Siyabend hene dilqê me da,
Evîn namire, dijî dewr û zemana da.

*

## XEZALÊ R'A

Îdî westiyam,
Singê ç'iyê va
Hatime xar.
R'ûniştim
Li ber ava
Kaniya sar.
Gava serî
Min bilind kir
Çi bivînim,
Vaye – vaye,
Xezala min
Li serê ç'iyê,
Qur'e, k'ubar
Li ser zinar,
Fêza kaniyê.
Ç'e'v û biriyêd
Xweye belek
Min tûj kiriye,
Pozê xweyî
Pîjîn li min
Bilind kiriye.
Dev û lêvêd
Xwe k'axetî
Min me't kiriye.

Bejina nazik,
Navkêlka zirav
Wê sekiniye.
Cî da sar bûm
Û sik'an bûm,
Nelipitîm.
Qursax nekir,
Berbirî te
Ez nehatim.
Çiye, min nevînî
Û çing nekî
P'aşla ç'iya...
Ezê vira,
Hema aha,
Ser darê p'iya,
Qe na, dûr va
T'emaşe kim,
Xezala xwe.

*

## Lİ SERÊ R'Ê

Li serê r'ê gune, me'lûl,
Sekinî bûm ez li te dûr,
Bi gavêd sist dûr dik'evim,
Qudûm t'une li çokê min.

Dik'evim r'ênga bine'rd,
Hev diçe - tê gele cime't,
Gelek bi heval, gelek t'enê,
Dijîn ser t'opa cehanê.

Ez zivir'îm gele p'oşman,
Li rênga xwe pajda hilk'işiyam,
Qe na carekê te bivînim,
Dîsa hêsra nebarînim.

Feqet hatim, tu wir' nînî,
Ew ciyê ez û tu lê sekinî,
Xalî bûvû ber ç'e'vê min,
Diha îdî kesekî din tune bû boyî min.

## HETA K'ENGÊ

Diniya derewa, h'eta k'engê
Tê ha bende bidî cezê,
Kevir – kuç'ika xî, k'a çî t'angê
Bikujî, paşê bidî r'êzê.

Û meyît'ê wan yeko – yeko
Kewkî dikî çawa mirar,
Ber te bende ne tişteke,
Ça p'incara çolê yekcar.

P'êp'es dikî, dih'incir'înî,
T'emiz, qirêj, dilsax û qelp,
H'esav yeke tu navînî,
Didî nav ç'e'va qalim û zerp.

Dişewitînî ter' û h'işk hevda,
Nizanî heqê qencî û xiraviyê,
Min ne lazime, hatime dinê da,
Ku bivînim haqa dilsariyê.

*

## DU QİR'NE

Du qir'na îro berê xwe da hev,
Cahaltiya zêrîn û ahaltiya maqûl,
Usa hev dûr bûn çawa r'oj û şev,
Rastî hev hatin ber gelîkî k'ûr.

Ev qir'na mine, - cahaltiyê gazî kir,
Lê qir'na te çû, e'mrê te pê r'a...
Ahaltiyê melûl serê xwe berjêr kir,
Ax, go, nazikê, h'eyîranim te r'a.

Çî te, çî qir'na, çî te salê min,
Tu germî hela hevraz banz didî,
Tu hela were veke dilê min,
Binihêr'e, tu ça tê da gul didî.

Ev kewa gozel cî da bû r'isas,
R'icifî, lerizî, go, heyî wax li minê,
Qincilî ser hev gune, belengaz,
Giriya, go, neçe, min bive wê qur'nê.

*

XAYÎLAZA REŞÎD

# EW GUL BÛ KUL

Devê gêlî sekinîî,
Dixazî biçinî gulê,
Dir'tisî, qursax nakî,
T'ev – hev nakî vê kulê.

Dir'tisî ku bişimitî,
R'a ne bî ser p'iyê xwe,
Û ber kaniyê r'ûdinêyî,
Disitrêyî h'emdê xwe.

Xule – xula vê avê
Ça zû hilda dengê te,
Bir'a ba jî bibihê,
Belake k'ulama te.

Kulê gişka t'ev r'abûn,
P'ist – p'ist k'ete ç'iya – baniya,
P'êlê be'rê şêlû bûn,
H'eta Xwedê jî giriya.

Xirme – xirma e'zmane,
Baraneke hûr barî,
Şil bûn deşt û arane,
Bû şever'eşeke te'rî.

Tu p'or' – p'oşman zivir'îî,
Ç'ilmisîî nona bilbil,
Dûr k'etî tu ji gêlî,
Ça te neçinî ew gul.

## EW DEQE ZÛ ÇÛN

Ez k'uda her'im,
Ez dîsa ça bijîm bêyî te...
R'ojê dine'lim, şevê h'işiyarim,
Ber ç'e'vê mine qeret'iyê te.

Min r'a xever didî,
Bi h'erdu desta min h'emêz dikî,
„Çiqas bedewî", - p'ayê min didî,
Sifetê min zorê hevraz dikî.

Ber ç'e'vê mine
Ev dîtina meye here h'ewas,
Serê te ser singê mine,
Delalê min, tu mêrê mêrxas.

Tu k'u têyî
Ji nava gul û sosina,
Şabûna qir'ka min bîn dikî,
Min r'a dibêjî: -„Kewa gozel, xanima jina!"

Dixast biçûma...
Qeyî k'êleka te va mix kiribûm.
Çiqas şîrin bûn ew deqana,
Sed h'eyîf, sed yazix,
Ew deqe zû çûn...
Lê bîra min neçûn.

❋

## R'ÛNİŞTİME...

R'ûniştime ker' û lal,
Hesra hêdîka tînime xar,
Mir'ûzêm e'wrê giran,
K'enê min çû ça bazirgan.

Nerm xwe da dip'onijim,
Ciyê xwe da qeyî dihênijim,
Mitale hev dik'evin,
R'ojê zelûliyê tên bîra min.

Tê bêjî we'dê çûyî da
Bahar t'unebiye e'mrê min da.
T'im zivistana sar biye,
Dilê min tiştekî şanebiye.

Bendê dilsar qeyî bi t'emam
T'ovî hev bûn, dor min civiyan,
R'enı bûm, kesî ez nedîtim,
Şer' û box'dana da ez sûtim.

*

## BÛME PÎREK SED SALÎ

Bihêl r'azêm, bihêl r'azêm,
Nerevîne xewa min,
Ber p'êsîrêm şil û avzêm,
Hêsir neman ç'e'vê min.

Dişewitim, ça nevêjim,
Agir min k'et k'izirîm,

K'erbî te ez ker' û gêjim,
Kula da ez p'izirîm.

Çî min r'a ne e'mr bêyî te,
Diniya min r'a xik – xalî,
T'êr nebûm ji dîndara te,
Bûme pîrek sed salî.

## GUL NÎNİM

Xwezî gula sor bûma,
Wekî te biçiniyama...
Ez bîn kirama hergav,
Nep'er'itanda dil – hinav.

Ezîz – ezîz bivrama mal,
Bir'icifiyayî ça extiyar,
Daniyama ser sivra xwe,
Daniyama ber bîna xwe.

Û her sive teyê dilşa,
Ça xulamek ber p'at'şa,
Teyê min r'a qulix kira,
Silavek şîrin min kira.

K'ê dizane neç'ilmisiyama,
Hema usa geş bûma,
Teyê min r'a bisitira,
Ça t'im bilbil gulê r'a.

Bivûma dû û derman,
Bivûma qidûmê çokan,
Bivûma sebir – sik'an,
Boyî nevsa te, sal zeman.

T'une bextê min û te,
R'ast hev hatin bê we'de,
E'mr me r'a bû telik,
Ne tu gedeyî, ne jî ez keç'ik.

Lê agirê dil û hinavê te,
Hela duşuxule bê qeyîde,
Ne kanîme vêsînim,
Nazik jinim... gul nînim.

*

## BİRA BÊ, BÊ, HEVALA MİN

Ba k'a k'uye, bira bê,
Ezê kula xwe bêjimê,
Ezê dilê xwe ber vekim,
Zanim, emê hev fe'm kin.

Zanim, ba ça guneye,
Cî û sit'ar lê t'uneye,
Zanim, dike zare – zar,
Çol û baniya va tê xar.

Şev û r'oj naseqir'e,
Dibeze wek agir, alav,
Nona r'uh'êm nasit'ire,
Zîwîn lê tê ça hergav.

Bêjnê, k'uye, bira bê,
Serê xwe bide ser min,
Dilkê mine warê bê,
Bira bê û bê, hevala min.

*

## NEÇE

Neçe, e'mrê min, neçe,
Min nehêle t'enê vir',
Kar xezala min, neçe,
Kesek t'une te çêtir.

Dilê min gele me'lûle,
Îdî k'ê r'a şa bim ez,
Hêsira bi xule – xule,
Dik'işin weke Erez.

Xewa şeva h'izrete,
Şe'dene hîv û siteyrk,
T'êr nebûm dîndara te,
Bedewî, met'el ma xelq.

Bîra k'enê te dikim,
Miqama here xweşe,
Herr'o gazî te dikim,
Neçe, hûr – hûr nemeşe.

Dûr dik'evî tu li min,
Agir serê min dixî,
Qe napir'sî h'alê min,
Yan xamî, tê dernaxî.

Bûz dih'ele dive av
Bin germaya te'vê da,
Lê ez dih'elim hergav
Bin germaya ç'e'vê te da.

Pozbilindê, pozpîjîn,
Dev – diranê k'axetî...
Leglegê neke qûjîn,
Te ser sêlê ez pe'tî.

Dengê te dengê E'yîşê,
Bistrê dîsa carekê,
T'erk de gir'ik, zikêşê,
Ber te bûm wek kalekê.

Neçe, e'mrê min, neçe,
Min nehêle t'enê vir',
Kar – xezala min neçe,
Kesek t'une te çêtir.

*

## TU BETAL BÛYÎ

Xewna min şîrin bû,
Ez tê da bûm...
R'ex te bûm,
H'emêza te da bûm.

Te destê min girt,
Destê min r'amûsa,
Alavê min hilgirt,
Şewitîm usa.

## KANİYA DİLÊ MİN

Agirê evîntiyê
Ez bûme k'omik,
Derdê vê sur'ê
Nevîne qijik.

Derd – birînê min
T'emam t'ev r'abûn,
Te girt guliya min,
P'or' t'êl – t'êlî bûn.

Hêsirê min barîn,
Destê te şil bû,
Min kire axîn,
Kula min t'eze bû.

E'mrê xwe bidim
Ezê bona te,
T'enê nevînim
Evan hêsrê te.

Te dilê min k'irî,
Tê bê lerizîî,
Te serê min hilbirî
Bi nazik, e'zîzî.

Te lap dîn kirim,
Naxazim bijîm,
Nerm dik'izirim,
Serê min bû gujîn.

Berbanga sivê
Min ç'e'vê xwe vekir,

Dilêm bi h'ubê
Gelek nalîn kir.

Ez k'ume, tu k'u,
Tu k'uda çûyî,
T'evî vê xewnê
Tu betal bûyî.

*

## DİVE, WESTYAYÎ

Ez dixazim
Te r'a bilîzim,
Lê tu naxazî...
Dive westyayî?
Gele k'ûvî me,
P'ir' beyanî me,
Bide dû min,
K'aş ke guliya min...
Diçim ber avê,
Tu bide navê
Û bike çirpîn,
Avê min bir'eşîn.
Ezê bi wîrqînî
Bikme qar'înî,
Ji cewê derêm
Û dûr bir'evim.
K'el û bîn her'im
Û heyî bizivirim,
Qirşa kewkî kim

Û t'êr bik'enim.
Ezê şabûna
Bidme nav xişra
Û bilik'umim,
Destê xwe bih'erêşim.
Xûnê bik'işe
E'rdê bir'ije...
Bikme ofe – of
Bi tir's û bi xof.
Cî da sar nebe,
Sipîç'olkî nebe,
Hanga birînê
Tu k'ûr girêde.
Me'niya birînê
Li r'ex min r'ûnê,
T'êr' min bivîne,
Bir'a ew kul
Dilê min da nemîne.
Ez dixazim
Te r'a bilîzim,
Lê tu naxazî,
Dive, westyayî?...

*

## E'MR BÊYÎ TE

E'mr bêyî te qe nexweşe,
Diniya p'ûç'e, boşe betal,
Ça bikim wekî r'ojam r'eşe,
Te r'a nabim be'lgî, berp'al.

Ax, xwezilam li wê nevsê,
Li r'ex teye herr'o, hergav,
Cina r'a nadî r'eqasê,
Naşewitînî nona alav...

*

## ŞEMS ŞE'DEYE

Dil digirî
P'ir' zelûlî,
Hêsir barîn
H'ezar alî.

Devê kula
Îr'o vebiye,
Derdê dila
T'evî hev biye.

Tamar usa
Zerp lê dixin,
Tê bêyî miclise,
T'evî hev dixin.

R'uh'ê min da
Hev diçin tên,
Nona belekiya
Qeyî jorda tên.

Xirme – xirma
Giran dikin,
E'wr, e'zmana
Hev p'ar dikin.

## KANÎYA DÎLÊ MÎN

K'ila sirsûm
Qe ne tişte,
Xwe dik'ilêm,
Bîna min diç'ike.

Ava zer qeyî
Li min dizê,
R'ast û derew
Min didin r'êzê.

Lêlêye r'abim
Herim çolê,
E'mel p'ir'in,
Naêne yolê.

Ç'iya û baniya r'a
Ezê gilî kim,
Bendê qelp r'a
Hevaltiyê nakim.

Ezê dexesa
Dûr xim wêda,
Lê boyî dilsaxa
Bivme xalî da.

Gur'ê serê ç'iya
Min gez nakin,
Lê gur'ê dup'ê
Wê min h'ep kin.

H'irç'ê geliya
Diha r'emin,
De'vê çalep'iya
Diha fe'min.

**XAYÎLAZA REŞÎD**

Me'rê şûlikî
P'ir' dir'tisim,
Min gule kî,
H'alê wî jî dipir'sim.

Lê ez bende me,
Yek nona we,
Min ne şih'itandiye
Cî – warê we.

Haqa qelpiyê
Hûn ku tînin,
Ava kaniyê
Dih'er'imînin.

Kevir - kuç'ika
Kewkî dikin,
Nav – nûç'ika
Hûn min dikin.

Mixenetin,
Min vediçir'in,
R'ast Xatûnim,
Çi veşêrim.

Ber dinê me
H'usnê xwe va,
E'sl çê me
Cisnê xwe va.

Xwe r'a bêjin,
Bibih'ecin,
Ez dengbêjim,
Lê ne a'cim.

## KANİYA DİLÊ MİN

Nevsa min t'êre,
Be'ra bê bin,
Silavam xêre,
Jîrim, êgin.

Dive r'okê
Hûn jî r'abin,
Bixûnin vê ç'îrokê,
Min r'a şa bin.

Diniyam tê hev,
Divim bînteng,
Westiyame ji şev,
Mitalêd r'eng – r'eng.

Şems şe'deye,
Qûlêd serr'eş,
Pê qir'êja zimanê we
Navme r'ûr'eş.

Yeke, Xwedê
Ez bîr tînim,
Û her siba
Dua' dikim.

Dibaxşînime we
Evê ç'e'vnebariyê,
Belkî hûn jî
Bên ser r'astiyê.

*

## TE BERNADİM

Te pê ç'e'va gazî min kir,
Ezê diha zû r'abûma,
Min xelqê dora xwe şerm kir,
Hindik mabû bir'eviyama.

Te dora xwe kes nedidît,
H'uşê te t'enê cem min bû,
Zanim şêrî, zanim e'gît,
Tê bê, te xwe unda kiribû.

Zeftê der bû, lê ez hatim,
Te ez dame ber dilê xwe,
Te got, bihêl te h'emêz kim,
T'êr te bîn kim, bedewa xwe.

Bihêl, te r'a ez bilîzim,
Min k'erba xwe unda kiriye,
P'or' – guliyê te jorda bînim,
Çima te serî berjêr kiriye.

Min binihêre h'usulcemal,
P'ake, Feqî tu nedîtî,
Wê bîr kira Dîlbera delal,
Dil û hinav min şewitî.

Lê tu, lê tu min dir'evî,
K'uda diçî, xezala min,
Ji min çima dûr dik'evî,
Qe navînî tu h'alê min.

Were, k'êleka min r'ûnê,
Birîndarim, k'ûr dine'lim,
Bîr ke çi bêjî r'û dinê,
Bivîne, bona te dimrim.

Biqelêşe „k'efenê“ min,
Ji „gêlî" der xe, tu min sax ke,
E'mr bide min carke din,
Min r'a şa be, tu min h'iz ke.

Tu şîrinî, tu diniyayî,
Dilêm zane, çi h'iz kiriye,
Ser te mame met'elmayî,
Bêje, te çi serê min kiriye.

Kewa gozel, werdeka ava,
Bes bimeşî, min bih'elînî,
H'eta k'engê ezê dûrva
Maşoqa te bim, min bizêrînî.

Dengê teyî zîz wek leglega,
Qur'e – qur'e tu r'ê diçî,
K'etîî destê min şêrî da,
Kuştina mine, cîkî da naçî.

Lê k'ê dîtiye ku nêç'îr bê
Û ber nêç'îrvan bisene,
Dinê xirav be, k'ê jî bê,
Ez te nadim t'u kesane.

XAYÎLAZA REŞÎD

## ÇÎ MİN R'A NE DİNÊ

Hîvî te dikim
Neê xewna min,
Û berbangê zû
Diçî nona mû.

Xewnê da usa
Didme te pir'sa,
Cawa min didî,
Xweş xever didî.

Em xweş dik'enin,
Hema şa divin,
Bi k'en, laqirdiya
Hildik'işne ç'iya.

Nonanî horiya
R'ûdinên dev kaniya,
Gula diçinin,
Kewkî hev dikin.

Hevdu t'êr nabin,
Gêlî da xar dibin,
Dîsa disitrêyî,
Dilêm disoyî.

Te vediger'înim,
K'ulama dizivr'înim,
Şev nîvê şevê,
Bin r'onaya hîvê.

Naziyê xwe dikim,
Giva serma dikim,
Xwe ditelînim,
Qest dir'icifînim.

Min h'emêz dikî,
Giliya şiro dikî,
Usa dilovan,
Bi can, bi h'eyîran.

E'mr tişt nîne,
Qencî dimîne,
Heye h'iz kirin,
Û heye mirin.

Heyî tu k'ulamtî,
Ezberî û helbesttî
Dilê xwe vedikî,
Û axîn dikî.

Paşê ez te r'a
Dixûnim şi'êra,
Têm ber dilê te,
Dixûnim r'uh'ê te.

Hişiyar divim aha,
Tunebiye tiştê ha,
Lê vê xewnê xweştir
Çi hebû çêtir.

Lema şer' dikim,
Neê xewna min,
Paşî vê xewnê
Çî min r'a ne dinê.

*

## SOND DUXUM

Destê te da ez sond duxum,
H'eya xweş bim, r'û dinê bim,
Ç'e'vêd belek ez bîr nakim,
T'enê ezê bona te bim.

R'onaya ç'e'vê te bim,
Ç'ira di nav mala te bim,
Sebir, sik'ana dilê te bim,
Bîna ber nefesa te bim.

Sur'a dilê te beyan nakim,
Hevala r'a gilî nakim,
Herme ax û berê sar da,
H'ubê bimîne dilê min da.

*

## „MEMÊ ALA“

Te r’a bêjim „Memê Ala“,
Zîn nade hev ç’e’v û biriya,
Êvar da h’eta berbangê
Xew nak’eve ç’e’vkingê wê.

Dema ç’e’v û birû tên hev,
Vedicinîqe ew ji xew,
Dema t’irê h’emêza te da
Destê teye nav guliya da.

Sive safî be, r’o bilind be,
Zînê berbi te bilive,
Nazik – nazik, bi dil û can
Wê bê - „Memê, ez bi qurban“.

Bese „Memê“, dilê min digirî,
Min bive baxçê t’or’kirî,
Baxçe daye boyî me amin,
Bir’êjin em lit’ivêd şîrin.

Dewsa sewtînya neyara
Bibihên k’ulama bilbila,
Û çawa cew xweş disitrê,
Ça şivan zor dide bilûrê.

Sur’a min tu beyan neke,
Hevala r’a gilî neke,
Evîntî ne destê meye,
Ew jî dayîna Xudêye.

*

## BİHARE

Bihare, bihar,
Ji xewa şîrin
H'işyar bye adar,
U xweş distrê.

Li e'rşê e'zman
Dive hewarze,
Birqa birûskê
E'wra va dibeze.

Ç'em jî wê hêrs biye,
K'enara dertê,
Qulinga ji be'riyê
Şirît girtine tên.

Şivanê bengî
Pêşya keryê pêz,
Bilûrê dixe,
Bihara r'engîn,
Tu xêr hatî, xêr.

*

## TU AHA DERENG

Tu aha dereng li ji k'u têyî,
Serê te ber te da usa digrîî,
Gelo, tu ji k'ê aha xeyîdîî,
Hûr – hûr gav dikî, usa melûlî.

Divekî k'esî r'ê va te şêland,
Birin xişrêd te û morî – mircan,
Yan guharê zêr' ji guhê te qetand,
Lema digrîî, nazya canik – can.

Dilê min birin, wê ber xwe da got,
Û ez dax kirim, sax – sax ç'e'l kirim,
Delalê min çû, wê dil – hinav sot,
Dil kir yeke din û ez bîr kirim.

## EZÊ GUNÊ XWE E'FÛ KİM

Te ez pe'tim, nona sêlê
Şewitîm ez ker' û lal,
Wekî naha mi xî k'êrê,
T'une niqitka xûna al.

Ser agrê te bûme k'izrik,
K'iz – k'iz min hat, niqitîm,
Gula geş bûm, gele r'indik,
Bese hewar, p'er'itîm.

Dil û hinavêm bûne sûsme,
Qeyî bê, dame ber gula,
Bûme t'êl da, qeyî r'istime,
Qewat nema van mila.

T'enê te r'a ez şa divûm,
K'en jî min bûye h'izret,
Ji qûl – benda k'ûvî bivûm,
Tu bûyî ava avh'eyat.

At kirî bûm ber zyaretê,
Min soz dabû Xwedê xwe,
Wekî xweş bim h'eta – h'etê,
Nadim k'esî şêrê xwe.

Wekî dinya dewremîş be,
Bir'a t'enê hebî tu,
Wê qir'neke t'eze şîn be,
Dixazim sêrî da şa bî tu.

Mirazekî dinê bikî,
Bivî xayî k'omî – k'ulfet,
E'mrekî nuh şêletmîş kî,
Nona Aqû xayî dewlet.

Wê dinê ezê te hilêm,
Ezê dua' te bikim,
Ber Mîrê xwe ezê r'ûnêm
Û gunê xwe e'fû kim.

Ezê bêjim gunê min çiye,
Nekiriye xeyba qîz – xorta,
Pişta derya neteliyame,
Ne ya derewa me, ne jî ya forta.

Cawa mezina nedaye,
Ne diziye tiştê xelqê,
Her sibe Şems nedîr daye,
T'emiz bûme ber Xerqê.

Gunê minî mezin eve,
Min h'iz kirye mêrê çê,

Min go, dinya r'onik eve,
Min bîr kirye şîrê dê.

Bav û bira wêda kirye,
Destê xwe her tiştî şûştye,
Şevê bêxew safî kirye,
Mal û h'al cîda hiştye.

Sivê h'etanî êvarê
Serê min da biye t'ek ew,
T'êr nebûme ji dîndarê,
Birîna dilê min biye ew.

Ezê bêjim, ezê bêjim,
Qe na, hema ce'nmê da,
Derd û kulê xwe bir'êjim,
Sivik bim bin xaliyê da.

*

## R'O DA NAÇE QÎRA DİL

Ez Xatûna şertê xwe me,
Ne sêva h'emû k'esa me,
Bêje çima te ez dîn kirim,
Ji dinyayê k'ûvî kirim.

E'mir min r'a te bê te'm kir,
Qeyî xêlîkek li min wer kir,
Nona bûkek li ber p'erdê
Xwe vedişêrim ji xelqê.

H'ewas nakim ji cî r'abim,
T'evî xêr û şer'a benda bim,
K'etim nava çi agirî,
Xurê min bû av û girî.

Serî hilnabir'im ji belgî,
Ne birçîme û ne jî t'î,
Ne jî nexweşeke beth'alim,
Lê tu were k'ûr dine'lim.

Dikim her'im ez ber avê,
Evîntya dil bavêm navê,
Bira r'o da her'e qîra dil,
Min r'a ç'ar kirye p'ir' – p'ir' kul.

## GUHDAR BE, DİLO

Dilo were, guhdar be, dilo,
K'esî h'iz neke,
Neve hêsîr da nona bilbilo,
Ç'e'vê xwe veke.
Evîntî p'ir' û p'ir' bê ît'bare,
Wersê r'iziye,
Ew herr'o k'oç'e, ew herr'o bare,
K'ê xêr lê diye.
R'o û de'neke, r'iya wê p'ir' kine,
Ez r'ast divêjim,
Bende t'ev yeke, çi mêr, çi jine,
Zanim, ne gêjim.

Dil şewatim, lê ne ç'e'vnebar,
Xêrxazim, xêrxaz.
Bes dilo, bese, nebe gur'a h'ar,
Boyî evîntya fêlbaz.

*

## GUL BENGÎNE

Gul bengîne,
H'ezar r'engîne,
K'ok istrîne,
Heyî, gulno!
Dil bengîne,
H'ezar dilqîne,
H'izretîne,
Heyî, dilno!

*

## MİN TU...

Min tu dûrva dîtî,
Lê te ez naz nekirim,
Ez xweda p'ir' şewitîm,
Te ça ez zû bîr kirim.

Hêdî – hêdî dûr k'etî,
Kirme nava vê fikrê,
Ax, min dîla dilpe'tî,
Nikarim bikim t'u ç'arê.

*

## WEXTA TU...

Wexta tu nêzîkî minî,
Agir – alav bona minî,
Wexta tu dûrî minî,
Gul û nûrî, bona minî...

*

## TE DİPİR'SİM

Te dipir'sim,
Qe natir'sim
Gelo tê çi
Cawam bidî.
Te dipir'sim,
Min h'iz dikî?
Dil da dih'evînî?
Yanê na?
Tu dizivir'î
Bi avir'î,
Min dinihêrî,
Ker' diçî.
Ez ker' û lal,
Dilsar, bêh'al,
Xeberêd xwe betal
Mam gunek'ar.

*

## DESTÊ TE...

Destê te qeyî t'ilizmate,
H'emêza te jî cinete,
Diniya r'onike k'enê te,
Te ez h'elandim,
Dîn bûm ser te...

*

## TU QUREYÎ...

Tu qureyî, ez zanim,
Ca bizivir'e, eyî, Xanim!
Gelo hêjayî hêsra min,
Yan qesta têyî xewna min...

*

## TE BİR...

Te bir, te bir xewa min, bir,
„Belgiyê" min jî te r'evand bir,
Şeva k'ûr da, berbang te bir,
„Min k'eniyayî", aqlêm te bir...

*

## ÇİMA HERCAR...

Çima hercar birîna min t'eze dikî,
Min dinêhêr'î, qeyî bê dilê min qul dikî,
Dik'izirim, çima tu ji min bawer nakî,
Îlac tuyî, çima derdê min derman nakî...

✱

## EZ Û TU...

Ez û tu usa ze'f nona hevin,
Îsal çend sale em hev diger'in,
Em hîviya hev man, lê salê me çûn,
H'eta em xwe h'esyan, em kal û pîr bûn...

✱

## TU K'UYÎ...

Tu k'uyî, r'onaya ç'e'vê min,
Dengê te îro nek'etye guhê min,
Nonanî dîna hatiye serê min,
Xever de, bibihêm, şarûr û bilbilê min...

✱

## TU NAVÊJÎ MİN...

Tu navêjî min, ez te h'iz dikim,
Zanim, h'iz dikî, ez t'exmîn dikim,
Xwedê lê boyî çi ev ç'e'v dane min,
Ez te hiz dikim, tu maqûlê min...

✱

## XWEZİL...

Xwezil ba bûma,
Minê le'zekî t'ûncika te r'a bilîsta,
Dîsa biçûma û dûr k'etama,
Dengê teyî şîrin dûrva bibihîsta,
Xwezil û xwezil, xwezil ba bûma...

## MİN Bİ DESTEKÎ...

Min bi destekî agir hil da
Û dilkê xwe şewitand,
Destê din nebû kanî da,
Agirê dil netemirand...

## MİN ZE'F...

Min ze'f û ze'f bîra te kiriye,
Navê te şîrin ser dilê xwe lê kiriye,
R'ojê newêrim navê te hil dim,
Lê şev berxewa gazî te dikim...

## XWEZİL...

Xwezil gula sor bûma,
Ber p'êsîra te bûma,
Herr'o te r'a şa bûma,
Li ber bîna te bûma...

## EZ BİHARİM...

Ez biharim, tu ne bilbilî,
Ez baxçe me, tu bê dilî,
Ez kanî me, tu ne t'îî,
R'uh'ê xwe va p'ir' bir'çîî...

✱

## NÎVÊ ŞEVÊ...

Nîvê şevê, xewa min naê,
Ç'e'vê min naçne ser hev,
Bêbextî min r'a diniyayê,
Sive dûre, k'anê k'ew...

✱

## HÊRSA TE...

Hêrsa te û sebra min,
Berenberin, e'mrê min,
Qursaxê te û bedewbûna min
Hevr'a şer'in, r'uh'ê min...

✱

## HÎVYA TE MAM...

Hîvya te mam, ez westyam,
Min derbaz bûn sal, zeman,
R'ojê min dan dû hev çûn,
P'or'ê serê min sipî bû...

✱

## BÎR NEKE...

Bîr neke, ku ez şayîrim,
R'uh'ê min negire k'efa xwe da,
Min berde, ezê bifir'im,
K'ê zane, naha dayînime k'uda...

## ORT'A XWE DA ME SÛR DANÎ...

Destêm nagihîje destê te,
Ort'a me da ç'iya û banî,
Lê va vir'im, vame r'ex te,
Ort'a xwe da me sûr danî...

## R'UH'ÊM BE'RE

R'uh'êm be're, okêanim,
Herr'o şer'e, pê dine'lim,
Fikir p'êlin, min dûr divin,
Û nava xwe dam dixeniqînin...

## DESTÊM VA...

Destêm va ser t'êlêye,
Va t'ov dikim hejmara te,
P'oşman divim vê deqêye,
Lê, dixazim bibihêm dengê te...

XAYÎLAZA REŞÎD

## TU XWEXWE XWE R'AZÎ NÎBE

Tu xwexwe xwe r'azî nîbe,
Qesta pozê xwe bilind neke,
Bir'a xelq ji te r'azî be,
Qenciya te pişt te gilî ke...

## ŞÎRET

R'astî heye şûrê du deve,
Lê zû ber baê xelqê nek'eve,
Hela dûr va r'ind t'erc û berc ke,
Paşê nav k'eve, ner'astiyê qir' ke...

***

Xelqê r'a neke çenge – çenge,
Zêr'ekî hêjaye her deqe,
Zanibe qedrê we'de,
Mala cînara hergav jî de'wate...

***

Dexesî heye nexaşîke girane,
Xêr û dû û dermanê wê t'uneye,
Wede da bide t'erka ç'e'vnebarane,
Qesta xwe neke dev û dirane...

***

Ew çawa e'rde, xayê wî t'une,
Ew çawa kaniye, av lê t'une,
Ew çawa gunde, mal lê t'une,
Lê ew çawa k'urde, xaliya wî t'une...

***

Hergê dixazî h'eta h'etayê
Te r'a bêjin, can – h'eyîran!
Kesekî r'a neke nêzîkayê,
Wekî t'emiz bimînî wek Xaniman...

***

Hevaltya qelp,
Wer'sê r'izî,
Ç'îka sêriye zerp,
Tişta dizî,
Xêra wî t'une...

***

Xêrk dikarî bibexşîne,
Qesta serê xwe neêşîne,
Bîr ke tu xiraviya benda,
Bir'a şe'de be jor Xweda...

***

Xêrxaza h'iz ke,
Xêrnexaza diha zêde,
Sidqê dilê xwe fîre ke,
Belkî ew jî bên ser qeydê te...

***

R'iya qelpa kine,
Zû tê bir'îne,
R'aste eva diniya mezine,
Lê xiravî k'îsî k'esî da namîne...

***

Ga bi cila naz nakin,
Ç'e'la bi zêr'a mêze nakin,
Deva bi çoka bar nakin,
Bendê fêlbaz h'iz nakin...

***

Te r'a gotin evsene,
Tu nexeyîde, bik'ene,
Sebir ke, r'eh'et r'ûnê,
Binihêr'in, paşê wê k'ê bik'ene...

***

Çiqas dixazî xem ke,
Li diniyayê t'erc – berc ke,
H'etanî ku dest neke,
Xema te tişkî k'ar nake...

***

H'iz neke xwe t'enê,
Xwe usa nîne dinê,
Çiye, bi kulê, bi te'nê,
K'eftar'ê, ji te naê bîna Înê...

***

Qet h'eyîf nînî, h'eyîf nînî,
Nona Îna qet nînî,
T'ek ç'ilovîzka hev tînî,
Ber nefera datînî...

***

Her r'ojek tê xemla xwe va,
T'eqil – t'oqiş cûr'ê xwe va,

Carna gul dide nona gula,
Carna dike nona kula...

***

R'oja derbazbûyî ça xewn
Qewat lê t'une, ça tişkî kevn,
Nava mitala, bîranîna da,
Dîsa nasit'ir'e, dide ç'ir'tika da...

***

Xeber nona gilok dezî,
Ew di destê te da ne,
Serî te girt, tê bizêyî,
H'eta k'utasyê wê her'e...

***

Ç'e'vnebar ser xweşya te
T'ucar nak'ene,
Lê ser nexweşya te
Wê usa bik'ene...

## BAVÊ MİN R'A

Bavê min,...
Tu hebûyî xayî û xudanê min.
Tu çûyî, te şikênand istûna dilê min,
H'eta hebim tu naçî ji bîra min.

## DAYÎKA MIN, ZADÎNA SEYÎDO

H'iz dikim te, ax dayê,
Bîna min bêyî te dernayê,
T'ukes qe mînanî te
Ber dilê min da t'u car nayê.

Diçim nava gul – sosina,
Ez dîsa lêv lop'erim,
Didim nav çayîr – çîmana,
Hema – hema te diger'im.

Diger'im ber devê ç'ema,
Dibihêm xul – xula avê,
Lê dayê, dengê te çima
T'im ber guhê min davê.

Eva diniya şîrine,
H'iz kirina xûşktiyê – biratiyê,
Te şîrintir kesek t'une,
Ax, ji te dûrim, mame xerîbiyê.

Dayê, tuyî her diniya min,
Eşq û bextewariya min,
Dayê, tuyî e'mrê min,
R'uh' û nifûsa ber dilê min.

*

## MAMÛKAÊ NE'S

Ew kur'kî biç'ûk,
Navê wî Memê,
Gelekî ne'sik,
Nake guhdarya İnê.

Sivê h'eta êvarê
Derva dilîze,
Maşoqê avê,
Dest – p'ê wî şile.

İnê hêrs dive,
Lê dike gazî,
De zû bilive,
Xewê naxazî.

Ew gava dibihê
İnê kir gazî,
Hilda navê xewê,
Diha dûr bezî...

*

## DÎSA BİÇ'ÛKİM

Ez dîsa biç'ûkim, min t'ir'ê,
Û dir'evim lez, berbi malê têm.
Diya min r'ûniştye ber t'ext û sivrê,
Û ber tendûrê bîna nonê germ tê.

Nonê loş, bok'on wê bilind bûne,
Dijbêr'im dîsa ez bok'onê sor,
Dayîka min h'ewas non hildibir'îne,
Duakê dike û dinihêr'e jor.

Diya min çû cewê ku avê bîne,
Ez jî yangiva xanî hev didim,
Avê bi devo tendûrê da dadihilîne,
Serê min dişo, ber tendûrê r'ûdinêm.

Û nava van mitalê xwe da,
Ez dîsa çûme bal zarotiyê,
Dizivir'im, dibêjim ez dayîka xwe da,
Ça a'ciz bûme, ez vê cahaltiyê.

*

## CARNA KU YEK XEVER DİDE

Carna ku yek xever dide,
Guhdarî ke tu ji wî,
Çika bal wî çi qeyîde,
Gilî dertên devê wî.

Ze'f xever da, nevê dîne,
Çela – çela zimane...
Carna giliyê r'ast wê bîne,
Wê te r'a bive gumane.

Nona p'incar'a bostana
Gava ku k'axan dikî,
Bijbêre wan xebera,
K'îjana begem dikî.

*

## XANÎMA MÎRZE R'A

Xanim - Xatûna kurmancî,
E'mrê Xwedê anî cî,
Ew bû xaya navê giran,
Pir's kin êl û e'şîran.

Biç'ûka kalkê min Mîrze,
Sergovendiyê da k'aw – k'aw bilîze,
Hûr – hûr bimeş wek cara,
Maqûl – maqûl nava der - cînara.

Zar û zimanê şekirî,
Şîret ke k'omê bi hûr – gilî,
Serê aqilî, k'emal,
R'aste, şe'deye şemal.

Bejin û bala xemilî,
Bedewê, dêmê gulî,
Gaz – gerdenê bi morî – mircan,
Werdeka devî ç'eman.

Dîsa jîr – jîr bimilmile,
Mêvanh'iza dilfire,
Sed h'eyîf, sed h'eyîf met'a min,
K'uyî xûşka bavê min.

Qir'nek îr'o dager'iya,
Met'a min xwe da milê ç'iya...
Xwezil min wan dewrana,
Kulîlk bûyî deşt û zozana.

*

## P'ORSORA MÎRZE R'A

Met'a min...
Bejna teye gilover',
T'imê tê ber ç'e'vê min,
Û ew gulya teye zer.

Ez diçime xaniyê te,
Ewî xaniyê kal – bava,
Dinêhêr'im dem û dezgê te,
Cî da nîne ça her gava.

T'oga sir'sûm k'ivş nîne,
Sir'sûm qulç' da sekiniye,
Li ser sir'sûm t'oz girtiye,
Gelo hîvya k'ê maye.

Met'ê evî k'oxî da,
Bi wan zendê badayî,
Toraq i'yar da cî dida,
Heyîlo zeman, k'u mayî.

Xwezil e'mr usa biya,
Met'ê dîsa bihata,
Ber tendûrê r'ûnişta,
Me r'a bok'ok bipe'ta.

*

## WERÊN, XÛŞKNO

Werên, xûşkno, k'arê min bikin,
Bi destêd nazik p'or'ê min şe kin,
Bi qeydê k'urdî gulya min vegirin,
R'êwî me diçim, hûn min ver'ê kin.

Bira dayka min îro mal da be,
Sivê zû r'abe tendûrê dade,
Çend nonê germ bike hevane,
Duakî bike boyî r'êwya r'yane.

Dayê ez diçim, dayîka min negrî,
Dilqê te nîne hêsir, melûlî,
Destê min berde, te ez h'elandim,
R'ênga min dûre, bihêl, ez herim.

Nenihêr'e evan ç'e'vê beleke,
Keç'a himberî kulîlka neke,
Şer'vanim dayê, tu r'iya min veke,
Zû bike dayê, tu min verê ke.

Diçime cem xûşkêd xwe gêrîl,
Ewêd ku dijmin birine çawa dîl,
Dayê min berde, bi wan destane,
Diçime şer'ê boyî k'urd û K'urdistane.

*

XAYÎLAZA REŞÎD

## K'URDİSTANA MİN

K'urdistana min zyarete,
Ava wê li ava qudrete,
Gelê k'urd lê ma h'izrete.

K'urdistana min, zêryayî,
Sal û zeman tu giryayî,
Dijmin bi zor tu hildayî.

Der û berê te ustrîne,
Dil û hinavê te birîne,
K'ê tê zor te hiltîne.

Emê bi van helebesta,
Bi xwîna şeh'îdên kelebesta,
Te xilaz kin li bin desta.

## GURCİSTANA MİN

Gurcistana min,
Dayîka p'ir' ewled,
Ç'e'vê te dik'enin
Bona her milet.

Şîrê xwe sipî
H'elal kir gişka,
Her yek kir r'ûspî,
Boyî nevêjin p'eşka.

Te nepir'sî, tu k'îî,
K'îjan welata,
Ji ku hatîî,
Vek'işe pajda.

Welle, te negot,
Gişk hildan wek kur',
Dil – hinav te sot,
Te got: „Werên, vir!"

Os, e'reb, e'cem,
Aysorî yan yê din,
Ew bi dil begem,
Çawa dê, te dih'evînin.

K'urd jî xwe te girt,
Ji Qersê, Wanê,
Kêrkûk, Sûlêmanyê,
R'evî hat derk'et Gurcistanê.

Gurcistana min,
Navê te şîrin,
Ez bengî kirim,
Ez k'urdim,
K'urdim, te dih'evînim.

⁕

# KURTEÇ'ÎRONG
## (NOVÊL)

### EM K'UDA HER'ÎN

Mileto, miletê bindest... Welato, welatê xelqê r'a mayî... Ser te mij û dûmane, qet nave sayî. Tu p'ir' çerçirîî, gelek westyayî, gelek hêsîrî te dît, miletê min...

Tu ç'iya r'a hatî, gelî û geboza r'a hatî, qeya r'a hatî, zinara k'etî, miletê min...

R'iya te r'ast nave, xayê te t'une... Û hergav serê r'iya te kelemin, kevir – kuç'ikin... Û e'dyê te p'ir' – p'ir' gelekin. Serê r'iya te hergav xûnê dir'êjin, qet'lê çê dikin...

Lawêd me biç'ûk, dergûşêd bê zar û ziman, ber dilê dayîka digrin û davêjne nava agir, cegera dê dax dikin.

Û dayîkêd me, xatûnê kurmanciyê, xêliya r'eş xwewer kirin... Destêd êt'îma digrin, dik'evne çil û ç'iya û diçin...

Qur'na r'a diçin, dewra r'a diçin, sal û zemana r'a diçin... Û wek r'iya xweye hergav xûnê r'a diçin, qet'lê r'a diçin, zulmê r'a diçin... û dîsa diçin.

Diçin, h'eya k'u û k'uda diçin, berbi k'ê diçin, t'u kes nizane... Yeke ew diçin...

Wek zar'oka xilfik, bê amin, me dixapînin... Lê sed h'eyîf, sed yazix em têne xapandin.

Dinya gişk gur'e, em ort'a wan da.

Weke ava ç'emê Dicle û Feratê xûna lawêd me dik'işe... Û r'oja îr'o, hema îr'o jî k'oka me tînin... Em k'uda her'in...

*

## H'İZRET

Ez dixazim welatê xwe, êr û misk'enê kal û bava. Ez h'izreta Mêsopotamyê me, ez h'izreta guşe – guşa ç'emê Dicle me, ez h'izreta xuşe – xuşa ç'emê Feratê me, eyî welat, h'izreta min, k'esera min.

Dixazim Geliyê Şengalê bivînim, dixazim gul û sosinê Geliyê Şengalê biçinim, kulîlka r'a şa bim...

Mame h'izreta Cizîrê, Cizîra Bota... Biçûma ser t'irba Mem û Zînê.

Ezê p'êxas, serqot biçûma ber zyaretê, zyareta Lalişê, quba Êzdîtiyê. Ezê ta bûma ber Dara Miraza. Bira Dara Miraza bigîhîne bextê miletê min.

Zyareta Lalişê, ez li te dûrim... Lê r'uh'ê xwe va ber te me, qûla te me, qûla dînê Êzdîtiyê.

H'izreta min, welatê min, axa min, K'urdistana min, dayîka zêryayî...

Welato, ez ji te dûrim, birîna dilê min k'ûre... Lê ez zanim, we'deye îdî... Ezê K'urdistana aza bivînim.

Erê, ezê K'urdistana aza bivînim...

Erê, ezê K'urdistana aza bivînim, ezê bêm Maqûl û Serwêrê K'urdistanê Mexsûd Barzanî bivînim. Bira hert'im bilind be k'olozê Mexsûd Barzanî!

*

## EZ Û TU

Me destê hev girtibû, nona du bengya, û bi meşa Leyîl û Mecrûm. Di van soqaqêd bajêre here mezin digeryan. Tê bêjî, me tiştek unda kiribû, tiştekî herî e'zîz li ser t'opa dinyayê û em wî tiştî digeryan. Bin hênkaya êvarê baê nermik hêdî – hêdî t'evî p'or û gulyê min dilîst, t'êl – t'êlî dikir. Wîte – wîta ç'ivîka, xişe – xişa belgê dara, xule – xula avê, û ew

xeberêd teye şekirî, ku gul û nûr devê te dibarî, divû zeyînet, divû cinet. Ez bi meşa Xatûna kurmanciyê ker' û lal r'ex te da dihatim...

Û heyî carna bi k'êlma şîrin, min serê xwe ber te dadixist. Ev çi e'cêve, qir'n îro dagerya, Xatûna kurmanciyê îr'o k'etye dilqê kareke xezalaye k'ûvî, ji hêlûna xwe k'ûvî biye, naçe mal û avaya... Her tişt bîr kirye. Mala xayê evîntiyê belkî kavla kulê be... Qîza maqûla t'evî xortê xelqê çi p'êşeye li devê ç'ema, li evî baxçê t'or'kirî da... K'a çi unda kirye...

Ax, r'uh'ê min îr'o min r'a şer'e, şer'ekî qalim diçe ort'a min û r'uh'ê min da. R'uh' nonanî p'êlê be'rê r'a dibe, usa r'eş wêda tê, ez xwexwe lê xof dikim. Divêm, ya Xwedê, tu min xwexwe ji min xweyî kî... Ev p'êlê r'uh'ê min usa p'êlne sawin, ez pêda dilerizim, çawa cûcika ser hêlûnê, ku e'wrê giran divîne, xwe dicivîne ser hev, diqincile.

Lê tu, teyîrê minî at'mece, difirî, nar'tisî evan e'wrê giranbûyî, ku dikare teyîrokê bibarîne û her tiştî k'av û k'ûn ke... Bê tir's û xof dîsa diçî r'ênga evîntyê da. Te got: „Leyîla min, ku p'êlê be'rê r'avin, ezê bifir'im hewa û te hilbir'im. Ku teyîrok bibare, ezê bi van p'er' û baska ser te têkme sit'ar, nahêlim tu biç'ilmisî".

*

## R'UH'Ê MİN

R'uh'ê te gazî min dikir, min va e'yan bû, ez bê deng û h'is berbir'î te dihatim... çawa xewnê da horî û p'eriya Zînê birin p'encera oda Memê Ala r'a dahîştin. Wan horî – p'eriyê dora Zînê îr'o min jî ber bir'î te tînin. Ez dihatim, heyî jî nonanî wan gulêd der bihara bin baê sivik da ku mêl divin, ez jî nava mitala da niqo dibûm, gelo bi çi teherî emê ç'e'vê hev binêhêr'in.

Ez dîn bûvûm, sur'a evîntiyê, wek baê birûskê, h'uşê serê min firandibû, li r'ê û dirba derxistibû. Min nizan bû der û dorê min çi diqewime... Min t'enê tiştek zani bû, wekî nona Zînê, nona Xecê, nona Leyîlê bengî bûme, li haj baê dinyayê t'uneme. Deqekê bîra min çûbû ku k'ême ez, ji xûn û qinêta k'ê p'erwede bûme. Erê, wê demê, hema wê demê, min xwe unda kiribû û k'etibûme dilqê xezala beyanî.

Dilkê minî hêsîr dişewitî, dip'er'itî... Min t'irê eve wê ji defa sîngê min derê û here Mala Xwedê şikyat, wê şikyatê min bike ku k'ubarya jina qur'e wî dizêrîne û ew dilkê hêsîr teyax nake, dive gimp'e – gimp'a wî, defa hewarê dixe, hewarê dixaze, hewar boyî navê Xwedê.

Lê ez qalemest û serh'işk dik'evme ber gunê dil, çawa Bek'oê E'wana ort'a bext û miraza da. R'uh'o hêsîro, ez te r'a qayîl bûm, ne bi xwestina xwe, lê bi xwestina te û t'ebyetê, çawa bendê r'ik'neta Adem û Hewaê, min milê xwe te r'a danî. Te da pêşiya min, ez r'ê derxistinı birim.

R'uh'ê te gazî min dikir, ez bal te bûm, te çima ez nedidîtim? Tu çima nizanî ku ez bûme qûla dil? Dil ez kirme qûla xwe û lema jî ez bal te me...

Lê tu min navînî...

*

## XİRAVO, ZEMAN

Ez gelîkî k'ûr da me, nikarim jê derêm, lapder binê gêlî da me, qet û qet haj baê dinyayê t'uneme, çi diqewime dora min, ez k'ume, ez nizanim. Dora min çirpînya karê xezalanin, wîte – wîta teyîreda, xule – xula avê kaniya, guşe – guşa cewikêye, baê berêvarê lêdixe, şînayî p'êl dide, qeyî tê bêjî p'iste – p'ista gul û sosinane, ew h'ub û evîntiyê hevr'a gilî dikin. Eva gişk t'evî - hev dive miqameke here xweş,

miqameke ji wan miqamêd Bax û Bêt'xovên, qeyî bê çê dive evî gelî da...

Lê t'enê ezim hêsîr û gune, melûl û ustuxar. Min xwe qincilandye li ser hev, çawa xezaleke ku baran lê ke, bir'icife û cî û sit'arê wê t'une be, here k'u, berbi k'ê û k'uda here, xwexwe jî nizane. Bi dilqekî aha ez serhevda hatime, nav - dilê min dir'icifin. Çima, ev çi e'cêve, Xwedê!

Qet k'esek navîne h'alê min, qet k'esek gunê xwe min nayîne. Na, divekî benda îsafa xwe unda kirye yanê bê r'emtî hatye dinê?

Ya R'ebê A'lemê, tu bide xatrê navê xwe, tu h'evkî îsafê bidî bendê ser r'eş...

Weyî li min, weyî li min, çi bêjim bext û r'oja xwe r'a! Dinya derewa, çi bêjim sidqê bendê qelp r'a!

Wexta tu dik'enî, t'emam te r'a dik'enin, heval, hogir, der cînar. Hergê tu nexweşî, k'en ber devê te nak'eve. Tu hew dizivir'î, xeyîsetê gişka giran dive, nonanî e'wrekî r'eş, tu bê hewe, ji evî e'wrê giran naha teyîrokê bibare. Qeyî tê bêjî yê dora te jî k'arê xwe dikin, wê niha bigrîn. Tu wan dinêhêr'î, xwe dinêhêrî, tu divêjî, welle k'esekî k'esa t'une, k'esekî ber dilê te da bê t'une, t'emam jî ji te dir'evin... Heyîlo, ez k'u, evana k'u...

Û tu dîsa dimînî t'evî xem û xyalê xwe, t'ev kul û derdê xwe...

Heyî zeman, xiravo zeman, bêbexto zeman...

K'ê wê dest bavêje min, min ji gêlî der xe?

## EZ TE ZE'FTİR K'URÊ TE H'ÎZ DİKİM

Îr'o r'oja bûyîna teye, delalê min, e'mrê min, şabûna min. Lê tu gelekî dûrî minî... Minê çawa bixasta ez bihatama ber dayîka te t'emene bûma. Ber dayîka te bik'etama ser çoka û min jê r'a bigota: „Dayê, ez ze'f ji te r'azî me wekî te şêrekî aha aniye û mezin kiriye, wekî ez pê r'a firnaq divim, pê r'a şa divim".

Nizanim, ew çi dayîke, min nedîtiye. Dive horiye, dive p'eriye... Lê zanim ew, dayîka teye, k'îjanê jî tu colangê da h'ejandîî û te r'a lûrî gotye û tu k'etîî xewa şîrin da. Dayîka te nizane wekî ez usa gelekî te h'iz dikim û emekê wê dişêkrînim. Îzna min t'uneye, ez pê r'a xever dim û bêjmê da: „Ez kur'ê te gelekî h'iz dikim. H'iz dikim bê h'esav, e'mrê xwe ze'ftir. Weyî, ez lêlê me pê r'a bivme peza qurbanê".

Sivê zû ezê r'abim ber Şems ta bim, ezê bêjim: „Şemso, ya te ser seh'eta delalê min, bira bê ser seh'eta min!"

Lê, dayîka te nizane ez Xatûna şertê xwe me. Ez k'esî r'a hela nebûme qurban. Wekî dayîka te zani be, ez usa bê h'esav te h'iz dikim, gelo wê çi bike? Dive k'umr'eşyê bike, bêje, k'êye eva hana, ça min ze'ftir kur'ê min h'iz dike.

Erê, minê jê r'a bigota, erê dayê, ez te ze'ftir kur'ê te h'iz dikim!

✳

## H'ETA DİL NEK'ENE, Ç'E'V NAK'ENİN

Ez gazî Xwedê dikim wekî te bîr kim... Gazî her H'eft Mêrê Dîwanê dikim, gazî mêr û milyak'etê qenciyê dikim wekî te bîr kim.

Lê na, dîsa nikarim te bîr kim...

Ez carake dinê dizivir'im û dîsa gazî Xwedê dikim, gazî p'êxemberê h'emû dîna dikim, h'emû dîn û h'evandinê her mileta, lê na... Dîsa û dîsa te bîr nakim...

Bêje min, lê wê çawa be h'alê min, ez ça te bîr kim. Ez gele û gele hîvî û lava dikim ber te, ber te dik'evme ser çoka, bêje min, divekî tu min hîn kî, min r'a bêjî, ez çi teherî te bîr kim. Bêje, yanê na, ez p'ir' beth'alim, ezê xwe bikujim, ezê xwe qeyê da bavêjim, ezê her'im xwe ava da ber'dim, bir'a ez r'oda her'im û bivme xurê h'ûtê binê be'ra.

Bê Xwedê, ez dimirim, lê tu haj min t'uneyî, tu çi zanî çi diqewime nava dilê min da. Te va te'riye h'alê min. Ez te va naême k'ivşê, ez nava şever'eşê da nim, dora min te'rî û te'rîstane. Lê tu nava r'onayê da sekinîî, te va te'rî k'ivş nîne. Minê bixasta te r'a bigota, tu bê Xwedêyî, lê nikarim... Nikarim te bêşînim, qêmîşî te nakim, dir'tisim tu hêrs bivî û dengê xwe ser min bilind kî. Lê ez naxazim dengê te bilind bibihêm. Ez hîn bûme wekî tu h'emdê xwe min r'a xever didî û gul û nûr ji te dibare, tu ber xwe da nerm vedibeşirî û ç'e'vê te dik'enin. Minê t'irê dilê te dik'ene, dilê te jî nona dilê min dik'ene...

Lê nizanim... Ew jî min va te'riye. Gelo dilê te jî dik'ene? Min t'irê erê.

H'eta dil nek'ene, ç'e'v nak'enin.

# SERECEM

EZ Û JÎÎNA MİN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 3
1. DİNİYA R'AZA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 7
2. BEXTÊ T'UNE, ÇÎ LÊ BİKİM . . . . . . . . . . . . . . . . 8
3. BÊK'ÊFÎ, EZÊ TE R'A BİSTRÊM . . . . . . . . . . . . . . 8
4. ÇİMA, BÊJE . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 9
5. NÊÇ'ÎRVANO . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 10
6. K'ANÊ, K'UYÎ . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 12
7. BÛKA DAYÎKA MİN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 13
8. BÊ BEXTİN EM . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 14
9. ÎLACA MİN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 15
10. DİZÎKAVA EZÊ BÊM . . . . . . . . . . . . . . . . . . 16
11. EW XEWN BÛ . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 17
12. „E'MELA" TE ME . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 19
13. MİN T'İRÊ TUYÎ . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 21
14. DİXAZİM, TE BİKİME E'YNAT . . . . . . . . . . . . . . 22
15. Ç'E'VÊ MİN DA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 23
16. ÇÎ BİYE TE R'A . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 24
17. KULÎRKA XÛŞK R'A . . . . . . . . . . . . . . . . . . 25
18. LÊ TU ÇÛYÎ, ÇÛYÎ. . . . . . . . . . . . . . . . . . . 25
19. NEGR'Î DİLÊ MİN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 25
20. Û NEÇÛMA. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .26
21. BOYÎ BÎRANÎNA K'ULFETA E'SLAN ABAŞÎDZÊ
S. 2003. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 26
22. LAWÊ MİN R'A . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 27
23. HÛN R'İND ZANİBİN . . . . . . . . . . . . . . . . . . 28
24. BİRA BİÇ'ÛK NEQUSİN . . . . . . . . . . . . . . . . . 28
25. GİŞKA T'EVÎ HEV NEKE . . . . . . . . . . . . . . . . 29
26. BİRA VEBE DERGÊ XWEDÊ . . . . . . . . . . . . . . . 30
27. BESE DİLO, BESE . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 31
28. R'ÛNÊ R'EX MİN, NONA DERSDAR . . . . . . . . . . . . 33
29. K'URDİSTANAM ÇAR P'ARÎ . . . . . . . . . . . . . . . 34
30. WÊ XEWA K'ÛR DA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 34

31. XİRDİR NEVÎ . . . . . 35
32. DENGÊ TE . . . . . 36
33. TE EŞQA MİN BİR . . . . . 36
34. TE NEPİRSÎ H'ALÊ MİN . . . . . 37
35. WERE, WERE, QEYÎDÊ BERÊ . . . . . 38
36. TU ÇA JÎ HEYÎ, HEMA USA JÎ TE H'İZ DİKİM . . . . . 39
37. LÊ EZ MAM GUMANA TE . . . . . 39
38. T'ENÊ TUYÎ GULA MİN . . . . . 40
39. Ç'EMO, K'UDA DİÇÎ LEZ . . . . . 41
40. BÊXEWTÎ . . . . . 42
41. GERMAYA Ç'E'VÊ TE . . . . . 42
42. QULİNG . . . . . 43
43.EZ QURBAN . . . . . 44
44. DİLÊ MİN BAL TEYE . . . . . 45
45. TU VİRA JÎ HÊRSA MİN R'ADİKÎ . . . . . 46
46. E'MRÊ MİN ŞÎRİN TUYÎ, TU . . . . . 47
47. EZ MELÛLİM . . . . . 48
48. BERBANGA SİVÊ . . . . . 49
49. KULA MİN . . . . . 50
50. DEWSA XWEDÊ . . . . . 51
51. TU R'AZABÛYÎ . . . . . 51
52. HÎVÊ – HÎVÊ . . . . . 52
53. MAŞOQA TE ME . . . . . 53
54. DİL ÇÎ DİXAZE JÎ R'UHÊ MİN . . . . . 54
55. QEYÎ . . . . . 55
56. SED H'EYÎF . . . . . 56
57. T'ÊYA . . . . . 56
58. EVÎN NAMİRE . . . . . 57
59. XEZALÊ R'A . . . . . 58
60. Lİ SERÊ R'Ê . . . . . 59
61. HETA K'ENGÊ . . . . . 60
62. DU QİR'NE . . . . . 61
63. EW GUL BÛ KUL . . . . . 62
64. EW DEQE ZÛ ÇÛN . . . . . 63
65. R'ÛNİŞTİME . . . . . 64

66. BÛME PÎREK SED SALÎ ........................ 64
67. GUL NÎNİM ........................ 65
68. BİRA BÊ, BÊ, HEVALA MİN ........................ 66
69. NEÇE ........................ 67
70. TU BETAL BÛYÎ ........................ 68
71. DİVE, WESTYAYÎ ........................ 70
72. E'MR BÊYÎ TE ........................ 71
73. ŞEMS ŞE'DEYE ........................ 72
74. TE BERNADİM ........................ 76
75. ÇÎ MİN R'A NE DİNÊ ........................ 78
76. SOND DUXUM ........................ 80
77. „MEMÊ ALA" ........................ 81
78. BİHARE ........................ 82
79. TU AHA DERENG ........................ 82
80. EZ GUNÊ XWE E'FÛ KİM ........................ 83
81. R'O DA NAÇE QÎRA DİL ........................ 85
82. GUHDAR BE, DİLO ........................ 86
83. GUL BENGÎNE ........................ 87
84. MİN TU... ........................ 87
85. WEXTA TU... ........................ 88
86. TE DİPİR'SİM ........................ 88
87. DESTÊ TE... ........................ 89
88. TU QUREYÎ... ........................ 89
89. TE BİR... ........................ 89
90. ÇİMA HERCAR... ........................ 90
91. EZ Û TU... ........................ 90
92. TU K'UYÎ... ........................ 90
93. TU NAVÊJÎ MİN... ........................ 90
94. XWEZİL... ........................ 91
95. MİN Bİ DESTEKÎ... ........................ 91
96. MİN ZE'F... ........................ 91
97. XWEZİL... ........................ 91
98. EZ BİHARİM... ........................ 92
99. NÎVÊ ŞEVÊ... ........................ 92
100. HÊRSA TE... ........................ 92
101. HÎVYA TE MAM... ........................ 92

102. BÎR NEKE . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 93
103. ORT'A XWE DA ME SÛR DANÎ . . . . . . . . . . . . . . . . 93
104. R'UH'ÊM BE'RE . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 93
105. DESTÊM VA... . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 93
106. TU XWEXWE XWE R'AZÎ NÎBE . . . . . . . . . . . . . . . 94
107. ŞÎRET . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 94
108. BAVÊ MİN R'A . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 97
109. DAYÎKA MIN, ZADÎNA SEYÎDO . . . . . . . . . . . . . . . 98
110. MAMÛKAÊ NE'S . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 99
111. DÎSA BİÇ'ÛKİM . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 99
112. CARNA KU YEK XEVER DİDE . . . . . . . . . . . . . . . 100
113. XANİMA MÎRZE R'A . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 101
114. P'ORSORA MÎRZE R'A . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 102
115. WERÊN, XÛŞKNO . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 103
116. K'URDİSTANA MİN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 104
117. GURCİSTANA MİN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 104

**KURTEÇ'ÎRONG ( N O V Ê L )** . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . **106**
118. EM K'UDA HER'İN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 106
119. H'İZRET . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 107
120. EZ Û TU . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 107
121. R'UH'Ê MİN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 108
122. XİRAVO, ZEMAN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 109
123. EZ TE ZE'FTİR K'URÊ TE H'İZ DİKİM . . . . . . . . . . 111
124. H'ETA DİL NEK'ENE, Ç'E'V NAK'ENİN . . . . . . . . . 111

**ХАЙЛАЗА РАШИД**

# ИЗ ГЛУБИНЫ МОЕЙ ДУШИ

Стихи и новеллы
(на Курдском)

"Езидская библиотека"
Тбилиси
2007

**KHAILAZA RASHID**

# FROM THE BOTTOM OF MY NEART

(poemtaly, novel)
(In Kurdish)

"Yezidish Library"
Tbilisi
2007



## XAYÎLAZA R'EŞÎD MÎRZOÊVA – MAXSOYÎ

Ji diya xwe biye sala 1964, 14 meha h'ezîranê. Hê di biç'ûktiyê da dest bi e'frandina şêra kiriye. Şêrê wêye pêşîn sala 1985 di r'ojne'ma k'urdî „R'iya T'eze“ da neşir bû. Xêncî şêra ew usa jî bi nivîsara pîyêsa û sikêça va mijûl dibe. Şêrêd wê ser zimanê gurckî hatine t'ercime kirinê.

Helbestvan xebata civakiyê jî dike. Di k'omela „Yektiya êzdiyêd Gurcistanê“ da serwêra k'oma kûltûraêye.